


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 58 | 2014



Gera li gora Êlas Efendî

Ameşa Spenta - Nemirên Pîroz

Herêma Cizîrê û Qamişlo binase!


Sîyarê Têrika

Zazakîya Aksaray ra

Cegerxwîn û ristek

Kitêba Nuh Ateş a bi navê NIVÎSÊN PER

bi naveroka serpêhatî, bîranîn, serhevde û şîroveyên bi zaravayê xelika, ji aliye weşanên APECê ve hat weşandin.



Nuh Ateş, 01.01.21948an li gundê Xelika (Karacadağ-Kulu-Konya) yê hatiye dunê.

44 sal in li Elmanyayê ye.


Zanyariya sîyasî û pedagojî xwendiyê. Ji sala 1970î vir da di nav xebata sîyasî, komeletî û nivîskariyê de ye. 16 sal in nivîskarê kovara Bîrnebûnê ye.

Berhemên Nuh Ateş yên ku heta niha çap û belav bûne ev in:

İç Anadolu Kürtleri
Tayek Por
Nivîsên Per

Çend rêz ji pêşotina nivîskar;

" ... Sewa ku ew wenda nebin, baştir bên xwandin û belavkirin min xwest wan wekî kîtebê bidim weşandin. Ku we xwand hunê bibînin, mijara nivîsan curbicur e û pirtir li ser ziman, jîyan û kultura gundê Xelika ye. Meriv dikana pîraniya wan wekî nivîsên antropolojîk yê li ser gundekî kurmanç li Anatoliyayê jî binav bike. Bîrek ji nivîsan taybetmendiyê xwe heye. Ew ê li gorê kevnehunera kurmanca ya katkirinê (vegotinê) hatine nivîsandin. Li gorê vê kevnehunerê, meriv berî ku destpê qalkirina mijarê bike, hekayetekê kat dike. Yanê di nav hinek meqeleyan da para hekayetan jî heye. Eger meriv bixwaze nivîsan li gor beşên edebî parva bike, hingê bîrek ji wan dibe serpêhatî, bîranî, pêkênî, şîrove... Mijara henan jî rabûn û rûniştinên civakî û sîyasî ye. Mijarek jî kurmançiya ku li Xelika tê dengkirin ..."





7

KURD- DER'Ê NASNAMEYÊN
BEŞDARBÛN Û SERKEFTÎNÊ
BELAV KÎRÎN

73
AVUKAT TEVFİK
DEMİR'İN ARDINDAN



22

Ameşa Spenta - Nemirên Pîroz



28

"Moschophoros"
(carrier of calf/barkêşê golikan)



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 58 | 2014

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Edîtor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma redaksiyonê

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit
Duran, Mem Xelîkan, Mustafa Mih, Özgür Kara û Yusuf Polat

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet:

www.birnebun.com / www.birnebun.eu

Têkili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfın: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgîro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Bîrnebûn" Bankgîro—Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec—Tryck AB



Ameretat meleka nemirîyê ye.

Wêneyê berg: *Listik*, boyaxa run û akvarel, Bekir Dari

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên,
serast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji Bîrnebûnê **6**
Alî Çiftçî
- KURD-DERê nasnameyên beşdarbûn **7**
û serkeftinê belavkirin
Mem Xelikan
- Ji Baselê piştgiriyê xurt ji bo namzetên BDPê **9**
Ecevit Yildirim
- Zûgotinok **11**
Mem Xelikan
- Gera li gora Êlas Efendî **12**
Konê Reş
- Gund û goristana Dugirê **14**
Konê Reş
- Çîrok **21**
Jordan
- Ameşa Spenta - Nemirên Pîroz **22**
Seyfi Doğan
- Herêma Cizîrê (Binxetê) û Qamişlo binase! **25**
Konê Reş
- "Moschophoros" (carrier of calf/barkêşê golikan) **28**
Jordan
- Kaç Co kaç **29**
Uskê Cimik
- Şopên dema xatirxwastinê-V **31**
Nuhê Hecî Malê Herşîd
- Xoşewîsta lêvîncan **36**
Xizan Şîlan
- 39** Ey mirovê virek
Xizan Şîlan
- 41** Gula zer
Mam Recall
- 42** Berf dibare
Medine Kerpiç
- 43** Yarê
Medine Kerpiç
- 44** Çêroka Hût
Nuh Ateş
- 46** Demeke xemgîn bû
Seyfi Doğan
- 48** Li yad
Heinrich Heine
- 50** Sohbetên Mamê -II
Mam Recall
- 54** Siyarê Têrika
Dr. Mikailî
- 61** Dema ku kurdan nav li demsal û mehan
kirine, kilam li ser wana jî gotine
Jordan
- 62** Zazakîya Aksara ra
Arêkerdox: Serdar Öztürk
- 64** Cegerxwin û rîstek
Alan Pîr Mem
- 73** Avukat Tevfik Demir`in Ardından
Kamil Sümbül

Ji bîrnebûnê

Li 30ê adara 2014an helbijartinên şaredariyan li Tirkiyê û Kurdistanê Bakûr heye.

Redaksiyona kovara Bîrnebûnê bi minasebeta vê helbijartinê di hejmara 57an de bal kişandibû ser girîngiya tev-lêbûna vê helbijartinê û dexwaziyên ku em jê dipênî wiha hatibûn rêzêkirin;

- *Bikaranîna zimanê kurdî di karê propaganda û kombûnên helbijartinê da!*
- *Naskirina xelkê kurd û mafê wî yê çarenûsî bi awayê fermî!*
- *Perwerdeya bi kurdî, kêmtir dersa kurdî ya ferz, ne ya helbijartî!*
- *Îstifadekirina ji îmkanên dersa kurdî ya helbijartî û ji bo vê teşwîqkirina xelkê wan cîhwaran!*
- *Navlêkirina cîhwaran bi kurdî be. Gund, qesebe û qezeyên kurd yan jî kurd jî lê wekî nîştêcîh dijîn û yên cade û meheleyên wan duzimanî, bi kurdî û tirkî bin!*

Hilbijartinên şaredariya îsal bi taybetî piştî zagona nû bo kurdên me yên li Anatoliyê pir girîng in. Li gor destûra nû, ji bilî şaredariyên navçeyên navendî(qeza), hemû şaredariyên bajarokan(belde) hatin rakirin. Gund û bajarokên berê êdî wek taxên navçeyan tînin qebûlêkirin. Bi vê guhertinê re, li Anatoliya Navîn, li qezayên wek Kulu,

Cihanbeylî, Bala, Yunak, û Heymanayê ku piraniya nifusa van navçeyan kurd in, derfeta kurdan ku li van navçeyan şaredariyan bidestxînin zêde ye.

Niha li Cihanbeylî û Kuluyê namzetên kurdan êşkere bûne. Pêwîst e kurd li gor ev xalên li jor, tevbigerin û rayên xwe li gor wê bidin namzetên ku li xwedî nasnama xwe derdikevin û diparêzên.

Xelkê me yê Anatoliyê, heta niha li gund û bajarokên xwe, herçiqas zimanê xwe bi fermî nehatibe qebulkirin jî, ji ber muxtar an şaredarên ku li van gund û bajarokan dihatin hilbijartin, her kurd bûn û bi zimanê xwe ji xelkê xwe re xizmeta şaredariyê dikirin.

Niha ji ber ew derfet hêdî ji ortê radibin eger şaredariyên van navçeyan bi destê kurdan ve neyê rêvebirin gelek neheqî û zahmetî dê bo kurdên Anatoliyê çêbibin.

Lazim e, şaredariyên li hemû navçeyên navendî yên Anatoliyê, heta li yên bajarên mezin, ên wek Ankara û Qonyayê jî zimanê kurdî fermî bêt naskirin û xebatkarên van şaredariyan bi duzimanî, kurdî û tirkî bizanibin.

Em hêvîdar in ku ev hilbijartina îsal bi serkeftina namzetên kurdan be û bi aramî derbas be!

Newroza 2014an li we pîroz be!

Ali Çiftçi

KURD-DER'Ê NASNAMEYÊN BEŞDARBÛN Û SERKEFTINÊ BELAV KIRIN

Mem Xelîkan



KURD-DER`a Ankarayê ji sala 2008an vir de kursên zimanê kurdî dide. Ji wê rojê hetanî huro, bi hezaran xwendevan di xebata atolyê zimên re derbas bûn. Îsal jî nêzikî 400 kesi ji bo beşdarî kursên zimên bibin, serlêdan. Lê ji ber hin sedeman 250 kes beşdar bûn. Ji wan 130 kes bi serkeftin kursa zimên qedandin. 120 kesan spasname, 130 kesan jî belgeya serkeftinê girtin.





Roja 27.11.2013a li cihê komalê, bi navê TZP (Tevgera Ziman Parastinê) KURD- DERÊ belge dan xwendekaran. Mameste Îsmail Beşikçi, Vekilê BDPê yê Rihayê, İbrahim Binici, berdevkên sendikayên girêdayî KESKê û hwd gelek kes beşdarî şevê bûn.

Serokê komalê, Mistefa Karaman di axaftina xwe de balkişand bi zimanê dayîkê xwendin, axaftin û parastinê. *"Dema behsa zimanê dayîkê bê kirin pir tişt tê bîra mirov. Lewre zimanê dayîkê diyardeya mirovan a ji her alî ve ye. Kesayetiya mirov, hebûna mirov, cudahiya gelan, bi ziman diyar dibe. Ji ber vê yekê divê di her şert û mercî de zimanê dayîkê*

were parastin û pêşxistin. Gotina 'Zimanê min nasnameya min e, bê ziman jîyan nabe' pir rast e. Çewtîya wê, tunebûn ango mirin e. Ji ber wê yekê divê gotina rewşenbîrê mezin Celadet Bedirxan: 'Kurdino, malxirabno, an zimanê xwe hîn bibin an jî nebêjin em Kurd in.' Di bîra me de be. Ez li ser navê we hemuyan ji gor bihuşt re ban dikim: Tu rihet razê û bi me serbilind be. Em li pey te ne û li zimanê xwe xwedî derdê derkevin.

*Ziman beden e
Çand beden e
Erdnîgarî beden e
Û li bedena xwe xwedî derkevin."*got.

Vekilê Rihayê İbrahim Binici "Va roja rojeke dîrokî ye. Em li rojeke dîrokî civîn e. Zimanê me nasnama me ye."Got. Û ji yên keda wan di vî karî de heyî re silav û spasiyên xwe pêşkeş kirin.

Sosyolog Îsmail Beşikçi jî "Her ku zimanê kurdî azad dibe, Kurd û Kurdistan jî azad dibe." got û rola sazîyên wek Kurd-Derê anî ziman.

Şev, bi şênahîya mûzik û stran nan bi dawî bû.

Ji Baselê piştgiriyeke xurt ji bo namzetên BDPê yên Qulekê û Cîhanbeyliyê

Ecevit Yildirim

Di 30ê adara 2014an de, wê li Kurdistanê û Tirkîyê hîlbijartinên herêmî werin lidarxistin.

Guhertina zagona şaredariya bajarên mezin, ji bo herêma me jî bi bandor e. Gora zagona nû ji bilî şaredariyên navçeyên navendî, hemî şaredariyên bajarokan hatin rakirin. Gund û bajarokên berê êdî wek taxên navçeyan tên qebûl kirin.

Bi vê guhertinê, li Qulekê û Cîhanbeyliyê ku dora 70% nifusa her du navçeyan kurd in, cara yekemîn derfeta bîdestxistina her du şaredariyan derket holê.

BDP jî bi lez, hêz da kar û xebata xwe ya li herêmê û ji bo her du navçeyan jî namzetên xwe dîyar kirin.

Ne tenê li welat, li Ewropa jî komiteyên ku ji hêla rêxistina BDP ya Konyayê ve hatin avakirin, bi kelecane karê xwe dimeşînin.

Komîta BDPê ya Swîsreyê di 19.01.2014 an de li bajarê Baselê, şeveke piştgiriyeke ya ji bo hîlbijartinên li Qulekê û Cîhanbeyliyê çêkir.

Di şeva ku ji tevahiya Swîsreyê zêdeyî 2500 kes beşdar bûn de, hevserokê gîstî yê BDP Selahattin Demîrtaş, serokê rêxistina BDP ya Konyayê H. Mehmet Bozdağ û namzetê şaredariya Qulekiyê Mustafa Çakîr jî amade bûn.

Namzetê şaredariya Qulekiyê Mustafa Çakîr di axaftina xwe de bal kişand ser zêdebûna nifusa kurdan ya li herêmê û got ew herêmê wek





Perçeya 5. ya Kurdistanê dibînin. Di berdewamiya dengkirina xwe de Mustafa Çakir diyar kir, ku ew ne li dij gelên din yên li navçeyê ne û ewê hemû gelên navçeyê hembêz bikin.

Hevserokê giştî yê BDP Selahattin Demirtaş jî di axaftina xwe de got:” Bi sedan salan e hûn li Anatoliya Navîn dijîn û bi israr li nasnama xwe xwedî derdikevin. Ji ber wê em rêz li ber we digrin.“ Dîsa Selahattin Demirtaş diyar ku serkeftina li Qulekî û Cihanbeyliyê hêz bide Kurdistanê jî.

H. Mehmet Bozdağ jî di dengkirina xwe de bal kişand ser rola însanên me yên li Ewropa dijîn û ji wan xwest ku telefonî meriyên xwe yên li welat bikin, da ku ew dengên xwe ji bo BDPê bi kar bînin.

Di şevê de eleqeyeke mezin ji bo nûnerên BDP hebû. Dema ku Selahattin Demirtaş, H. Mehmet Bozdax û Mustafa Çakir ketin salonê îzdîham çêbû û ew bi zor gihîştin

şûna xwe.

Hunermendên wek Ergîn Xelikan, Osmanê Lawo, Azad, Kawa û Memo Gelo jî bi hunera xwe mêvan coşandin û reng dan şevê.

26/01/2014an de roja yekşemiyê li Hollanda, bajarê Rijswijkê ji bo piştgiriya endamên şaredariyên Kulu û Cihanbeyliyê şevêka din jî hat li dar xistin.

Bi beşdariya hevserokê BDPê Gülten Kışanak, endamê BDP yê serokatiya şaredariya Kuluyê birêz Mustafa Çakir bi gellek mevanan va beşdar bûn.

Di şevê de kurdên Anatoliya Navîn ên li Hollanda, Almanya, Belçîka û Luxemburgê dijîn bi coşeka mezin beşdar bûn. Hozan Kawa, Hozan Dîno û ji herêma Anatoliya Navîn jî stranbêj Exsan Xelikan, Dogan Biçen û çend hünermendên din beşdarî şevê bûn.

Zûgotinok

Mem Xelîkan

Kê te xist

-Pîrekê

Bi çi?

-Bi badikê

Sewa çi?

-Sewa goştê golikê

Ax li min wê pîrikê

-Kêra reş li zikê

Ne dile ne gurçikê

Vî han garê kê yê?

- Garê keça min e

- Çel mê çel bizine

Keko tu Xwedê kî

- Teng zirav tê kî

Zirav zirav kenî

-çûçka evra pê kenî

Çûçik mara reş e

- Kete qula reş e

Hemreş kî nexwaşe

- Ber balgi tiji qalikê

zeweşe.

Nîsk û nokê

Tev kelî yê

Kete coqê

Coq miçiqî

Rûn biriqî

Lavikê paşe

Gog qumaşe

Lavikê mîran

Gog herîran

Şev reş e

Şûv reş e

Mî yê reş e

Berx li ber e

Ez ji hev dikim der e

Pîvana çoyê şivanan

Dema şivanek çoyekî

xwe çêke, ji darê şaxekê

dibire destê xwe li nava

ço dipêçe wek mistan

dide ser hevdu, zûgotina

li jêr dibêje û pîvana vî

digire.

Ço ço

Li ku rustî

Serê çiyakî

Kê tu jêkir

Şêx Abdillekî

Bi çi

Bi baltekî

Sewa çi

Sewa ço kî

Va şûna mistê

Va şûna Gustê.

Zarok li lîstikên xwe

dema ku hopikê (ebe)

hilbijêrin zûgotina li

jêr dibêjin. Billûr raste

kê hat ew vediqete û ji

hopikbûyîne xilas dibe.

Yê ku mayî herî dawî ye

dibe hopik.

Ûniz

Bûniz

Cayir

Çember

Malkê

Qember

Taze

Tîze

Quncike

Vîze

Piştik

billûr

Gera li gora Êlas Efendî

Diyarî ji nivîskarê kurd Enwer Karahan re

Konê Reş

Ji mêj ve min divêbû gora Êlas Efendî ziyaret bikim.. Ew ê ku di sala 1933an de li Amûdê, ji nişka ve çûye ber dilovaniya Xwedê.. Hingê Mîr Celadet Bedirxan di kovara HAWARê, hejmara 21ê, 5ê hizêrana 1933an de, baş li ser koçkirina wî sekiniye û pesnê wî daye û wiha gotiye:(Êlas Efendî ji giregirên Dêrikê ye. Zûve bi kurdaniya xwe hisiya bû u ji bona azahiya welatê xwe xebitiye. Min navê wî ji berê ve dibihist. Ji min re gotibûn ku ketiye hebsê, derketiye pêşberî Istiqlalê, cihabên zîrek dabûn.. Pêşdetir anîbûn Şamê. Hingê min bihîstibû ku Êlas Efendî derbasî xetê bûye û hatiye sûriyê. Lê hikumetê ew, wek hevalên din; nehiştibû ku li ser tixûb bimîne û hinartibû Dêrazorê..). Seydayê Cegerxwîn jî di eynî hejmarê HAWARê de wiha li ser Êlas Efendî nivîsandiye:(Êlas Efendî yek ji munewir û miletperwerên kurdan bû. Xebat û fidakariya Efendî di nav hevalan de ne winda ye. Ji hevalan re dilawerî, mêraniya Efendî eşkera ye. Tu kes nikare inkar bike..)

Vê paşiyê, di bihara 2013an de, dema ku ez li Amedê bûm ji bo kongreyê PENa kurdî û çav bi Enwer Karahan ketim, hingê giftûgoyek di nav bera me de çêbû li dor Êlas Efendî û gora wî... Min sozdayê ku li gora wî bigerim û wêneyê wê jêre bişînim.

Di roja 25.09.2013an de, di gel kalemêrê Kurd, hevalê Seydayê Cegerxwîn Salihê Silo (Bavê Musilh), ji Qamişlo û kalemêrê Kurd Sedîqê Kerro ji bajarê Amûdê, em çûn gundê Ebû Ceradê, cihê ku Êlas Efendî lê hatiye veşartin.. Li mala mixtarê gund Osmanê Hecî Îssayê Xello ku ji êla Kîkan, berrê Smaêla ye, bûn mêvan.. Wî ji me re got: (Li gor ku bavê min ji me re gotiye, em cihê gora wî nas dikin.. Gora wî li goristana ziyareta Şêx Mihemed e, 900m rojavayî Ebû Ceradê dikeve.. Û pêde çû û got: (Dibêjin; roja ku ew veşartin ferdek ji gulî û kezîyên bûk û jinan hat dagirtin..)

Piştî ku me çayek bi hev û din re vexwar, em bi hev re çûn ser ziyaretê û gora Êlas Efendî.. Sed mixabin, gora Êlas Efendî nedihat xuya ki-

rin, binerd bibû.. Me
cihê gora wî naskir û
bi keviyekî nîşan kir..
Û wek bawerî her yekî
ji me fatîhak di dilê
xwe de li ser cane wi
xwend..

Min ji Abdulqadir
û birayê wî Abdulazîzê
Hecî Îssayê Xello yên
ku bi me re hatin ser
ziyaretê pîrsî, çima Êlas
Efendî li vir hatiye ve-
şartin û ne li Amûdê,
tevî ku ew li Amûdê çû
ber dilovaniya Xwedê..?

Ji min re gotin:
(Malbata me û a Êlas
Efendî di kokê de
dihihên hev.. Em ji bir-
ra Mehmûdyar ne, yên Dêrika Çiyayê
Mazî.. A din, gundê me rastî Dêrika
çiyayê Mazî ye, da ku bayê çiyayê
Mazî bi ser gora wî de bibare.. û canê
wî di gorê de rehet bibe..).

Êlas Efendî; kurê Hecî Os-
man Axayê Reşo ye. Ji malbatek
welatparêz û naskiriye ji malbatên
Dêrika Çiyayê Mazî.. Nivîskar û
rojnamevanê Kurd Edip Karahan
jî ji vê malbatê ye.. Êlas Efendî ji
heval û hogirên Qedri Can, Reşîdê



Kurd, mele Abdulhadî, Evdê Têllo,
Qedri beg, Ekrem Beg û Mihemed
Begê Cemil Paşa bû.. Ew jî wek
wan ji neçarî binxet bûbû û xwe bi
refên Bedirxaniyan ve girtû.. Lê sed
mixabin, qederê jiyana wî ser û binî
hev kir, ew derfet nedayê ku bi têt u
tesel bi welatîyên xwe re bistirê..

Erê, piştî 80 salî, va em Êlas
Efendî bibîr tînin.. û wek ku kurdan
gotiye: *Ga dimre çerim dimîne, mêt
dimre nav dimîne.*

Qamişlo, 26.09.2013

Gund û goristana Dugirê

Konê Reş

Dugir: Ev gundê ku di sîh salên pêşî de, ji çerxê 20an mîna gundê (Meqtelê) bû, yê Mustefa Şahîn Begê Berazî ku li Kobanê ye.. Dugir jî, xweş wargêh bû ji welatparêzên kurdan re. Nexasim piştî sala 1923an û damezirandina dewleta Kemalî û belavkirina lîsteya bi navê 150 kesî.. Her wiha wê hingê bajarê Helebê û otêla (Baron) jî ku xwediyê wê yekî Ermenî, birêz Muradyan bû, cihê hevdîtin û civîna welatparêzên kurdan yên revyayî bû.. Erê, ev yek berî ku komelaya Xoybûnê di sala 1927an de li Libnanê bê damezirandin..

Sebareti gundê Dugirê; ev gund, ji kevintirîn gundên rojava ye. Gundeke ji du girên Romanî yên kevnar ku bi hev ve ne, pêk tê. Li ser rêka hevirmêş anku (Ipek Yol)ê ye, dor 22 kîlomitran rojavayî bajarê Qamişlo dikeve û 7 kîlomitran dûrî sînorê tirkîyê ye. Ji sedê salan ve gund bi danîstiyên xwe yên kurd ava ye û wiha ta roja îro..

Gund; yê hoza Dorika ye û axayên gund ji mêj ve û ta roja îro malbata Ebbês in û ewin yên ku serkêşya hoza Dorikan li rojava dikin. Malba-

ta Ebbês, bi mêvandariya xwe navdarin.. Ji ber merdiya wan, Erebên êla Tey navê (Mistefic), li wan kirine, anku yên ku mersefên wan yên xwarinê bi dûv hev de rêzin ji mêvanan re.. Ji ber kurdiya wan û vê merdiyê, mişextî û koçberên kurdan xwe li wan digirtin.

Li gor ku gerokê îngilîzî Cîms Bikîngham di pirtûka xwe de a bi navê (Geşta min a Îraqê), tîne zîman, ev gund di sala 1816an de ava bû û di bin hêza Xelaf Axa de bû. Xelaf Axa, yê ku wê hingê paytexta wî gundê Eznawirê bû. Eznawir; li ser xetê dikeve, raserî gundê Dugirê ye bi dor 8 kîlomitran an.

Wek ku me got; di destpêka çerxê bîstan de, ev gund wek navendekê bû ji welatparêz, mişextî û revayên kurdan re, nemaze piştî sala 1925an û têkçûna serhildana şex Seîdê Pîran li Amedê.. Erê taybetiya vî gundî ku rewşenbîr û welatparêzên kurdan yên pêşeng xwe lê girtine, lê kombûne û jê destpê kirine anku bûye wek navendekê ji wan re..

Di baweriya min de motka avakirina komeleya (**Xoybûnê**), lê hatiye danîn.. Taybetiya Dugirê ya giring

ku roja îro girek ji herdu girên wê bûye goristan ji welatparêzên kurdan re, wiha min nav lê kiriye.. Ji ber ku gelek rewşenbîr û navdarên kurdan lê hatine veşartin.. Vêca bi min xweş e ku ez giringiya gundê Dugirê, kesên ku hatine Dugirê û kesên ku li girê wê hatine veşartin ji xwendevanan re bidim nasîn.. Çiko rola Binxetê di rewşenîriya Kurdî de wek ku ji Mustefa Bozan Beg û gundê wî (Meqtekê) destpê dike wiha jî ji Cizîrê, gundê Dugirê destpê dike.

Di sala 1923an de, piştî ku Mihemedê Ebbês, biraziyê Silêmanê Ebbês axayê gundê Dugirê û hoza Dorikan û Xelîlê Ehmê, kesayetiyek ji gundê Beyandûr, bi hovîti li ser destê desthilata fransî ya ku wê hingê Cizîr dagîr kiribû hatin kuştin, hingî raperîna kurdan Cizîrê dijî dagîrkirina fransîzan ji Dugirê û Beyandûr destpê kir û di encam de fransî ji herêmê bi dûr ketin. Er, di encama wê raperînê de jî, çend serbaz û dor 70 leşkerên fransîzan hatin kuştin..

Di sala 1924an de, ji ber ku gundê Dugirê li ser rêka kerwanan bû, tev kerwanên ku ji Mêrdînê diçûn Mûsilê û Bexdayê tere derbas dibûn, di wê salê de Ihsan Nûrî Paşa û hevalên xwe Tewfîq, Rasim, Xorşîd, di rêka Şingal û Dugirê re derbasî Bexdayê bûne, piştî ku raperîna wan li Alikê

(Beytelşebab), têk çûye..

Di sala 1926an de Haco axa tevî beşekî ji eşîra Hevêrkan ku ji Misilman, Êzîdî û Xiristyanan pêk dihat, xwe li Dugirê girtiye û lê maye, ta ku fransîzan Tirbespiyê û çend gundên din dane wî..

Dugir, di van her sê salan de (1926, 1927, 1928), bûye xweş navend û bingeh ji welatparêz û fermanniyên kurdan re.. Piştî hatina Haco axa bi çend heyvan, Emîn Axa kurê Ehmedê Hecî Ebdellaha an Emînê Perîxanê, serokê êla Rema, ew jî li Dugirê bûye mêvan..

Sebaretî Emîn Axayê Perîxanê; dikarim bibêjim ku ew di şerê 1925 an de tevî ku mêldarê tirk bû, lê vê paşiyê tirk lê qulipîn û xwestin wî jî sirgûnî Enebolê bikin, lê wî li ber xwe da û şerê tirk kir.. Ta ku ji neçarî di serê havîna 1926 an de di gel birêk zîlamên Reman yên din pêre, di dewleta Frensawî, nav kurdên Sûriyê re derket.. Li sûriyê, Emîn axa jî wek Haco axa xwe li gundê Dugirê, mala Silêman axa Ebbês girtiye. Piştî çend heyvan ku sal qulipîye, anku sala 1927 an, ew û Haco axa li ser daxwaza Bedirxaniyan û kurê Şêx Seîd, Elî Riza, di rêka Helebê re çûne Bêyrûtê. Li Bêyrûtê ew jî bûye yek ji hîmdarên damezirandina komela Xoybûnê.. Pêleke baş Emîn axa li

Beyrûtê maye û zîvirî ye Dugirê. Di sala 1928 an de, bi efûya Kemalî re vegeryaye tirkîyê..

Di dawîya sala 1927an de Hacî Mûsa Begê Motkî û Kor Husên Paşayê Heyderî jî hatine Dugirê û lê bûne endamên Xoybûnê û her wiha sûnda Xoybûnê lê xwarine..

Çîroka hatina wan nav Kurdên Sûriyê wiha tê bîra min. Ji dema ku ez bîr dibim, di civatên Kurdên Binxetê de qal û behsa hatin û kuştina Kor Husên paşa yê Heyderî û mirina Hecî Mûsa Begê Motkî li gundê Dugirê dihat kirin..

Digotin; Hecî Musa Begê û Kor Husên Paşa, di gundê Xerabkortê re derbasî Sûriyê bûn.. Li ser daxwaza wan, Tahirê Mehmûd axayê eşîra Temikan, ew birin gundê Dugirê, nêzikî Qamişlo. Hingî Haco axa û Emînê Ehmed (Emînê Perîxanê, serokê eşîra Rema) jî di gel gelek ji giregirên Kurdan yên ku ji ber tirkan revyayî bûn li gundê Dugirê di mêvandariya Silêmanê Ebbês axayê eşîra Dorikan debûn û kar û barê xwe ji tevgerê Kurdî re dikirin..

Dibêjin, piştî ku Kor Husên Paşa û Hecî Mûsa Begê jî tevî wan bûne, li ser destê mîr Celadet Bedirxan bûne endam di komela Xoybûn de.. Ji ber ku sûnda Xoybûnê xwarin, divîbû di ber de têkoşînê bikin, ew têkoşîn jî

ku, xwe bi serhildana Agirî ve bigihînin û li kêleka serokê wê, Ihsan Nûrî Paşa û hevalên wî ala azadiya welatê xwe bilind bikin..

Wiha di serê bihara 1928 an de Hacî Mûsa Begê û Kor Husên Paşa ji Dugirê, berê xwe dane Iraqê, da ku ji gundê Barzan xwe bi çiyayê Agirî ve bigihînin.. Lê mixabin li bajarê Mûsilê jî rex Ingilîzan ve têne girtin û careke din wan li sûriyê, gundê Dugirê vedigerînin.. Li Dugirê, Hecî Mûsa Begê bi nexweşîya Melariya dikeve û di nav çend rojan de canê xwe ji dest dide û dimire. Hingê wî li serê kûpê girê Dugirê vedişêrin û ta niha gora wî li wire.

Ji wê hingê ve girê Dugirê bûye goristana welatparêzên Kurdan û gelek ji mezinên Kurdan têde hatine veşartin wek:

Sebareti **Silêman Axayê Ebbês**, xwediyê gundê Dugirê, dema ku ew di azara 1940 î de, li Beyrûtê çûye ber dilovaniya Xwedê, dibêjin hingê ew anîne Dugirê, li ser kûpê girê wê, di kêleka gora Hacî Mûsa Begê de, ji rexê başûr ve veşartin..

Haco Axa: Di 22ê nîsana 1940 de, Haco Axa jî çûye ber dilovaniya Xwedê, wê hingê ew jî li Dugirê di lêleka gora Hacî Mûsa Begê a bakur de, veşartin. Û wiha gora Hacî Mûsa Begê di nav herdu goran de maye.

Wê hingê, helbestvanê netewî Seydayê Cegerxwîn helbestek li ser gotiy, evin çend firdik ji wê helbestê:

*De rabe ser xwe xweşmêrê hêja
Hacoyê Haco rêberê kurda
Ne çaxa te bû tu çûye gorê
Te em tev hiştin ber zilm û zorê..*

*Seydayê Mele Ehmedê Namî jî ev
helbest li Haco gotiye:
Der sal hezar û nehsed û çil,
Bîst û didiwê Nîsana têrgul;*

*Axê me Haco yê dilovan,
Xemxwarê feqîr û jarên kurdan.*

*Yezdanê mezin bi rehmeta xwe,
Dil şad kirî bi ceneta xwe.*

*Bîst û sisiyê meha gotî,
Tîra felekê dilê me sotî.*

*Tabût gihabû ser mezarê
Rengê xwe dida riwê Biharê.*

*Ezmanê Cizîrê bû tarî,
Wê gavê ji ewran xwîn dibarî..*

Di sala 1956an de dema ku **Ebdulrehmana Axayê Eliyê Ūnis** ji Qewmê Çiyê, serokê berxwedana Sasûnê li gundê Maşûqê çûye ber dilovaniya Xwedê, li ser daxwaza wî, ew anîne li gundê Dugirê, di rex hevalên wî de veşartine.. Hêjaye gotinê ku Ebdulrehmana Axayê Eliyê Ūnis di sala 1936an de ji neçarî di

gel mirovên xwe binxet bûye. Li binxetê, desthilata Fransî destê xwe danîne ser û ew sirgunî bajarê Şamê kirine.. Li Şamê tevî kerwanê welatparêzên kurdan bûye û têkiliyên wî bi mîr Celadet Bedirxan, malbata Cemîl Paşa, Dr. Ehmed Nafîz û birayê wî Dr. Nûreddîn Zaza û yên mayî re çêbûye.. Ta ku vê paşiyê welatparêz û maldarê kurd Elî axayê Zilfo gundê Maşoqê li Cizîrê kiriye û daye Ebdulrehman Axa.. û wiha lê maye ta ku di sala 1956an de çûye ber dilovaniya Xwedê, hingê ew jî anîne li Dugirê veşartine. Kalemêr dibêjin ku helbestvanê kurd yê netewî **Hejarê Mukiryanî** wê hingê li Tirbespiyê bû, wî ev nivîsandin li ser kêla ber serê wî nivîsand. Nizanim raste an na..? Sed mixabin, ji ber ku gor bi mebest hatiye şikendandin, êdî nivîsandin nexuya ye:

*Ditirsin ey weten bimrim
Nebînim bextiyarî tu
Li bin pencê sitem dîsa
Bi ah û nal û zarî tu
Dil û canim bi gorî çûn
Ji daxwaza redayî tu
Bi nosim, da li ser gorim;
Welat xemgîn û men xemgîn.*

Di roja 05.04.1958an de, **Hemza begê Miksî** li bajarê Heskê koça dawî kir, li ser dazwaxa wî, termê wî

anîn gundê Dugirê û di goristana wê de hatiye veşartin.

Wek ku diyare, Hejarê Mukiry-
anî yek ji helbestvanên komara Me-
habadê bû, piştî herifandina komarê
reviyabû, xwe li nav Kurdên suriyê,
li bajarê Tîrbespiyê girtibû û çend
salan lê jiya ye.. Di sala 1958 an de
dema ku Hemza begê Miksî çû ber
dilovaniya Xwedê, rehmetî **Hejarê
Mukiryani** ev nivîsandin li ser kêla
ber serê wî nivîsand:

Mamose Hemza beg

Rehberê fidakar!

Pir kes ji xew te kirine hişyar

Raze bi xoşî bes menale

Peyman elê me ew hewale

Rojî ku welat bijî bibînim

Ez mijde bi xo bo te bînim

15 ê Remezana 1377 Koçî, anku 05/04/1958 Zayînî

Hêjaye gotinê ku gora Hemza
Begê Miksî di goristana gundê Du-
girê de di rewşeke xerab de bû; kêlên
wê hatibûn şikenandin, kevirên li
dor tirba wî hatibûn belawela kirin
û bi zor dihat nas kirin.. Ew jî mîna
pirraniya gorên welatparêzên kurdan
di wê goristanê de, ku hina bi me-
best ew gor xera dikirin..!! Jixwe gora
Hacî Musa Begê Xuwêtlî êdî nema
kes cihê wê nas dike..! Ji berî çend sa-
lan ve partiya Yekîtî ya Demokrat a
Kurd li Sûriyê (Yekîtî), gora Hemza
Beg restore kirin.. Em jî ji dil spa-

siya wan dikim.. Xwezî hina ji dew-
limendên Kurdan gora Hacî Mûsa
Begê Xuwêtlî jî nûjen kiribana.

Di sala 1967an de **Hesen Axa
Haco**, kurê Haco axa yê mezin li
Qamişlo çûye ber dilovaniya Xwedê,
ew jî birina li gundê Dugirê veşartine..

Dr. Ehmed Nafiz Beg di sala 1968
an de û ji bo dermankirina canê xwe çû
Beyrûtê, ku di nexweşxaneyê Emerîkî
de xwe derman bike, lê mixabin, têde
Xwedê canê wî yê nazik stand, bê ku
kes ji dost û hevalên wî li ber serê wî
hebin. Belê kebanîya wî (Medam
Îvon), daxwezên wî bi cî anîn. Ew
daxwezên ku her gav jêre digot; Divê
ez li gundê Dugirê bême veşartin.

Kebaniya wî termê wî ji Beyrûtê
anî Helebê, û ji Helebê tev heval û
hogirên wî serwextî mirina wî kirin.
Xelkên Cizîrê jî, bi tev neteweyên ku
têde dijiyan, ji Kurd, ereb, ermen û
siryana ve, çûne pêşîya termê wî, û ew
birin gundê Dugirê, spartin xaka sar
û cemidî, di rex heval û dostên wî de.

Wek ku me got, Dr. Ehmed
Nafiz Beg, ji doktorên kurdan yê
pêşîn bû di suriyê de, hem ji yê pêşî
bû di warê nivîsîna bi zimanê kurdî
latînî de. Di wê hingê de, Dr. Nafiz
dihat naskirin wek bijîşkê Hawarê,
hem jî bijîşkê Mîran û ji doktorên
kurdan yê herî pêşîn bû ku bi kur-
diya latînî nivîsiye.

Dr. Ehmed Nafiz bi sincên xwe yên xweş û welatparêziya xwe a zêde, hişt ku tev heval û hogir hez wî bikin û dostaniyê pêre bajon. Vê yekê hişt ku cihê wî di dilê piraniya wan de çêbibe. Ta ku seydayê Cegerxwîn di helbesteke xwe de ji mîr Celadet Bedirxan re wiha dibêje:

*Beğê min serwerê min, ey Celadet
Şahê min, rêberê min pir edaled..
Ji Nafiz beg bipirse ey beğê min
Derman çiyê ji bo derdê dilê min?
Birîndare ji ber daxa welate
Gelo derman heye jêre li ba te..*

(Hawar, jimar: 9/1932)

Mela Ehmedê Namî jî, di derheqa pesnê Dr.Nafiz de wiha gotiye:
*Bijîşkê xweş fîdakar û hinermend
Birûska hikmeta te çû Semerqend
Tû fexra miletê Kurdî delalo
Were sahtê bike derdim hevalo
Me dilsojek nedîbû xayrî Nafiz
Yekî di jî, Celadet begê Hayiz..*

(Ji dîwana Namî: Dazwazname, 1986)

Di sala 1973 an de, **Nezîrê Elîkê Bettê** li gundê Xalid Gilo çûye ber dilovaniya Xwedê, termê wî jî anîn gundê Dugirê û ew di goristana gundê Dugirê veşartin.

Di sala 1984an de dema ku **Arif Beg Abbas** li Qamişlo koça dawî kiriye, welatparêzên kurdan termê wî birine Dugirê û ew di goristanê wê

de veşartine. Arif Beg ji xelkên Madenê bû, di sala 1929an de ew jî bi Dr. Ehmed Nafiz û birayê wî Dr. Nûreddîn Zaza re ji neçarî ji tirkîyê derket, hat Helebê û Şamê, paşê li Qamişlo bi cîwar bibû..

Di roja 14.09.1985an de, nivîskar û dîrokzanê kurd **Hesen Hişyar** (Mele Hesenê Kurd), li Qamişlo koça dawî kir, li ser qewîtiya wî, termê wî rakirin gundê Dugirê, ew jî di rex welatparêzên kurdan de veşartin.

Hesen Hişyar, di sala 1907an de li gundê Serdê ku dikeve navbera Hênê û Licê de çêbibû.. Di serhildana Şêx Saîde, tevî ku biçûk bû, ji rex Kemalîstan ve hatibû girtin û zindankirin û paşê sirunkirin.. Di sala 1934an de ew jî wek welatparêzên kurdan yên mayî binxet bibû û di nav refên kovara HAWARê re dixebitî.. Di sala 1966an de wî bi tena xwe kovarek bi navê (Agahî), xurû bi kurdî li Qamişlo diweşand û belv dikir... Gelek pirtûkên wî hene, pîrrianiya wan distnivîsin.. Wî bi zimanê Kurdî, erebî, farişî û tirkî xweş dizanî bû.

Di roja 14-10-1992an de, **Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa** li Qamişlo şû ber dilovaniya Xwedê, hingê bi guhestina termê wî re ji bajarê Qamişlo, ta bi goristana gundê “Dugirê “ piraniya netewên Cizîrê, bi Kurd, Ereb, Ermen û Siryan ve beşdar

bûn. Ew li kêleka Dr. Ehmed Nafiz Zaza bi çî û war kirin. Li ser gora wî çend gotin di pesin û şarezaiya wî de hatin xwendin. Ji gotina dawî a metranê Ermeniyên Antiranîk wiha got: **(Dr. Qasim, sembol bû ji hev-girtina netewên Cizîrê re.. Pîroz be ji wî gelê ku ew jê ye..)** Dr. Qasim ji malbata Cemîl Paşa Diyarbekrî bû, piştî ku malbata wan di sala 1029an de binxet bû, ew li bajarê Heskê di sala 1932an de çêbibû..

Di sala 2008an de dema ku **Dr. Dara Arif Beg Abbas** li Qamişlo koça dawî kir, mirovên wî û kurd-perwerên Qamişlo termê wî rakirin, birin gundê Dugirê ew di rex bavê wî, Dr. Ehmed Nafiz û Dr. Qasim Cemîl Paşa de veşartin..

Û wiha gelek ji welatparêzên kurdan li gundê Dugirê hatine veşartin, min jî navê vî girî kiriye (Goristana Welatparêzên Kurdan).

Çend xalên giring:

Di van çend salên dawî de malbata Haco û malbata Ebbês kumbed li ser gora Haco û a Silêmanê Ebês avakirin û tevî ku gora Hacî Mûsa Begê di orta herdu goran de ye, bi sê-çar mitroyan tenê, lê sed mixabin kesî ji van herdu malbatan negot ez ê çend keviran li dor gora Haî Mûsa Begê rêz bikim da ku hema xuya be..!!

Pirraniya goristabên gund û bajarên Rojava bi ziyaretin, anku tirba seyidekî an Şêxekî lê heye û ew tîrb keskek di ser re daliqandiye, bi tenê goristana Dugirê bê ziyaret e..

Di salên 1960, 1970 û 1980 î de, hina bi mebest kêlên ber serê gorên wan welatparêzan dişkandin. Ta ku vê paşiyê diyar bû, dema yekî kurd yê komunîst ku li ber mirinê bû, mikur hat û qewitiyên xwe li xelkên xwe û zarokên xwe kir û ji wan re got; Law! Min li Dugirê veşêrin, da ku ez lêborîna xwe ji wan miriyan bixwazim, ewên ku min pirraniya kêlên ber serê wan şikandine.

Hêjaye gotinê, ku rêjîma sûriyê navê vî gundê kurdî yê orjînal wek tevayî gundên kurdan yê din, bi navekî erebî guhertiye, navekî ku hew nav jê pîstir heye.. Kiriye (Derek), bi wateya ew cihê herî nizim.. Ev gotinek gelekî nexweş e di zimanê erebî de..

Hem jî hêjaye ez bêjim; di sala 1995an de bi navê Dugir, kovareke edebî xurû bi Kurdî, ji rex kurdên Rojava ve yê ku li Swêdê dijîn hatiye weşandin. Xwedêyê wê Dr. Seîd Mele bû. Birêvebir helbestvan Ehmedê Huseynî, Zagrosê Haco û Yehya Yûsiv bûn.

Qamişlo 13.10.2013

Çîrok

Jordan

Bavek, li ber miriniya xwe, bang li kurê xwe kir, jê re waha got: Kurê min, ez mirim, wesîhata min li te ew e ku tu hespê min bidî yekî ahmak (kêmaqil). Lawê wî ji bo ku wesîhata bavê xwe bîne cih(şûnê) çend rojan şûnda rabû li hespê bavê xwe sîyarbû çû. Pir çû hindik çû gêhişt bajarêkî mezin. Li ber derfîyê bajêr komêk mirovên acaîb dît, li alîyekî, mirovekî makul, mîna Mîrekî, kinçên baş li xwe kirine, tacek li serî wî, mirovên der-dora wî şahîyan dikin. Ji alî din jî mirovek wek mîna wî, makul, lê di rewşeke ne baş, kinçên wî mîna gewenda, mirovên der-dora wî tû ser çavên wî dikin û heqereta pêdikin.

Mirovê me bi van ditînan mat mayî dimînê û ji yekî dipirse: va çi hal e û sebêbê vê bûyerê çi ye? Ev jî dibejê: Em her sal ji xwe ra Mîrekî nû hildibjêrîn. Ew destûr(qanuna) me ye. Mîrê sala çûyî me daxist û me

mîrekî nû da şûna wî. Bi van gotinan mirovê me bilez xwe gihand ba mîrê nû û lê ra waha got: Ez vî hespî didim te, ji ber ku wesîyeta bavê min e. Bavê min ji min re gotibû; vî hespî tu yê bidî mirovekî ahmak, lê heya îro min ahmaqekî mîna te ne ditîbû.

Dema ku xelkên bajêr van gotinan bihîstin hicûm ser mirovê me kirin, lê Mîr got; bisekinin! Destê nekin. Mîr ji mirovê me pirsî; manê vê çi ye? Çima ew ahmak e?

Mirovê me lê ra got: Mîrê min, tu dizanî ku tu ji bo salekê hatiye hilibijartin. Sala tê dîsa vê rojê dê te jî mîna vî mirovî li ser textê daxin bi te bikenin û te rezîl bikin. Tu va tiştana dizanî, lê dîsa jî tu mîrîtîyê qebl dikî. Li ser van gotinan, Mîrê nû, li bajarvanîyan vegerand û got: Heya ku em qanunên xwe neguherin ez naxwezim bibim Mîr!..

2626 (2014)

GIRÎNGÎYEK:
Numra kontoya me hatiye guhartin!
A nû ev a li jêr e:
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Ameşa Spenta - Nemirên Pîroz

Seyfi Doğan

Mitolojî çêrok in. Çêrokên ku însan, dunê xwe pê nas bike. Doralîyê xwe fehm bike. Ji bo ku fênomênên fizîkê û civatîyê îzah bikin, însanan mîtolojî pêya kirine. Lê bes ne tenê çêrok in.

Di hundirê mîtolojîyan da, gelek rastî hene ku ew me ji jîyanên kevn agahdar dikin. Pir û hendik, her xelkî mîtolojîyê xwe heyê. Mitolojîya gelan pir nezîkî hevdiine û hîc ferka nîne cîh û war. Çûnkî; îhtîyacên însanan bingehî wek emniyêt, xwarin û vexwarin û îzahata fênomênên fizîkî û fehm kirina dînê mîna hevdiine. Tabî li gor cografya tiştên cuda jî hene.

Mitolojîyên û Dînen kurda yê kevn, mitolojîyeke û dînekî ku bi gelên aryan ve hevpare. Dive em, parê xwe yê mitolojîyê û dîn bigrin û biperêzên. Mirasên mitolojî yê û dînen kevn jîyanê dewlement dikin û persivên henek pirsên giran didin û ew jî jîyanê hesa dikin.

Mitolojî û dîne kevn; kanis-tankên etîmoljîyê, tarixê, etnolojîyê û folklorê yê. Ez tenê nu-

munek dixwazim bidim. Ku ew nûmûnê di Birnebûneda heta bû nivisandin. Ew kelimê ku jê da min behs kiri bû, **derewîn** bû.

Ew peyv, di mîtolojîya kurdan-da ji kesê ku piştîpazîyê nerindîyê yanî drug dikin re dihat gotin. Yanê ew li dijî rastîyêne. Ew kelimê; hîn îro jî tê bikar anîn. Hîn bi hezaran peyvên wang û gotin hene ku kokên xwe ji mîtolojîyê û dîne kevn tene.

Di dîne Mazdaîzmê û Mîtolojîya ku ketîyê nav dîne Mazdaîzmê da şeş Ameşa Spenta hene. Ameşa Spenta mena xwe; Nemirên qutsî ne. Li gor henek zanyaran, ew şeş nemir, teybêtîyên Ahura Mazda ne. Li gor henek şirovanan jî ew fireştehên (melek) dîni Mazdaîzmê ne. Henek zanyarên dîni Mazdaîzmê hejmara Nemirên Qutsî bi Ahura Mazda ve tevhevdu dikin heft fireşteh.

Bi ya min; ew teybêtîyên Xwe-dayê mezin Ahura Mazda ne (peygamberê dîni Mazdaîzmê Zerdeştê) ku bi antropomorfîzmê ê tîne îzah

kirinê ne. Eger merî li fonksiyona wanan binêrê mêrî pir hêse dibîne ku ew;

Prensîbên dînî Mazdaîzmê ne.

Ji ber wê yê kê jî ez şeş Namirên Qutsî hesap dikim.

Min navên şeş namiran eslî wek di Zend Avestêda hatine nivisandinê nivisand ji bo ku em şopên dîrokê xwe fehm û nasnamê xwe

qelav bikin. Ji bo ku em kultura xwe fehm û nas bikinî.

Ez bi wê nivisê xwe dixwazim dest bi nasandina mitolojîya û mîtolojîya ku ketîya nav dînên kurda yên kevn bikim. Pir caran fonksiyonên aynê figurên mitolojîk dem û dem tên guherandin Ew jî ji bo ku li gor dem û cîh bersivê ihtiyacan bidî ne yê.

VOHU MANAH

Mena Wohu Manah; Armanca Baş a. Aqil temsil dike. Dînê Mazdaîzmê; dine aqil û basîratê yê. Însan bi aqilê xwe rîya durist û rast dibîne. Ji sê prensîbên dînî Mazdaîzmê „fîkr baş verin raman kirinê „temsil dike. Wohu Manah însanan bi fehm kirine dide û rêberiyê wanan dike.



AŞA VAHIŞTA

Aşa, hemî felsefeya dînê mazdaîzmê temsil dike. Szûmana heqanî. Aşa, rastîyê, duristîyê û nîzamatîyê. Ew bêtavîz li dijî drug û mur^te wî derewinan mucadelê dike. Aşa; pakijîyê, aşqa, serkeftina, alîkarîyê, aşîyê û bêhgunchîyê



KŞATHRA

Piştîpazê cengevaren ku ji bo aşitîyê kar dikine. Ew parêzkerê desttenga û şerbazayê.



AMERETAT

Ameretat meleka nemirîyê ye. Pir caran bi Haurvatat ve tevehevdu xuya dikin. Herdu ya jî bi gulûgîya û avê re tekilîya xwe hene.

Herdu jî îlahîyên bereketê ne.



HAURVATAT

Dewlemendî û tenduristîyê temsîl dike. Haurvatat ji bo tenduristîya ruh û bedenê rîya rast bi însanan nîşan dide. Tenduristî, dewlemendî ye. Cimkî; li gor dînê

Mazdaîzmê kar kirin îbadetê û bingahîya dewlemendîyê ye.



ARMAÎTÎ

Nefsbicûk, mitêwazî û axê comert û destfirehîyê temsîl dike. Armaîtî îlaha bereketê û biharê ye. Axê dunê li biharê comert û dest fireh dibe.

Armaîtî békêmasî ye.



Herêma Cizîrê (Binxetê) û Qamişlo binase!

Konê Reş

Herêma **Cizîrê** Ango **Binxetê**, Eva ku bajarê **Qamişlo** têde ye, dikeve herî bakur û bareşî suriyê de. Ji bareş ve sîmorê Îraqê ye, ji bakur ve sînorê tirkîyê ye (Serxetê). Ê zincîra çiyayê Torose wek çiyayê Mazîdaxê, Xursê, Mêrdînê, Bagokê ta ku digihêje qontara çiyayê Cûdî.

Di salên cenga cîhanî a yekemîn de 1914-1918, dema ku elmanan xeta hesinî (Berlîn-Bexdad), gîhandin Nisêbînê, ji wê hingê ve navê Serxetê û Binxetê hatiye gotin, kurdên li jêr xetê man **Binxetî** û kurdên li jor xetê bûn **Serxetî**.

Parêzgeha Cizîrê ango Heskê - senter bajarê Heskê ye - ji mazin-tirîn parêzgehên suriyê ye. Pîvana wê 23,333 k.m2. Hejmara xelkên wê ta sala 2002an dor 1,313,099 neferîye, ji bilî kesên kurd ku bê nasname mane û hin din ku navê wan qet nehatiye tomarkirin. Cizîrê navdare bi dûzbûn û firehbûna xaka xwe, nexasim bi **Deşta Mêrdînê (Beriya Mêrdînê)**, **deşta Xelef Axa** (Sin-ceqê: Aşîta) û **deşta Hesinan**, hem jî bi çiyayê Abdulezîzê û beşekî ji çiyayê Şingalê û Kewkebê Milan û çiyayê Qereçoxê Mosîsana.. û her wiha bi çemê **Xabûr** û **Ceqceq** û **Dicle**.

Cizîr di cîhanê de navdare bi gir, şûnwar û şaristaniyên herî kevin û dêrîn ku têde hatin avakirin wek: **Orkêş** li girê Mozan û bi çandîniya zeviyên havînê û zivistanî, wek ganim, ceh, nok, nîsk, pembo û bi Petrola û Gaza ku li Rimêlan û Qereçox û Cibise hatiye dîtîn..

Ji kevin de Cizîr cih û warê gelek eşîr û hozên kurda ye wek: Kîkan, Milan, Koçerên mîran, Aliyan, Hesinan, Abasan, Mîrsînan, Hevêrkan, Koçekan, Deqoryan, Gabaran, Temikan, Bûbilanan, Kasikan, Hacisilemana, Kureseyan, Dorikan.. hwd. Ê hin eşîrên ereban, di gel hin gundên Sîryaniyan..

Di navbera salên 637-639 zayîne de, piştî ku Helwan û Tekrît ji rex misilmanan ve hatin vegirtin, misil-mantî ketiye Cizîrê û Nisêbîne de û gelek dîroknivîsên ereban behsa kurdan di Cizîrê û Nisêbînê de kirine wek: Ibin Xerdazbe, Qudame Bin Cafer, Mesûdî û Ibin Cibêr.. Vê paşiyê Cenkîzcan, Holako û di peywan re Tîmor Ling di sala 1394 an

de Cizîr wêran kirine û xelkên wê xwe di quntara çiyê de veşartine..

Di sala 1514an de, Cizîr ketiye bin destê Osmaniyan de û di sala 1922 an de destê Fransîzan de, û weha ta sala 1946 an û dameziran-dina dewleta erebî di suriyê de.

Piraniya xelkên Cizîrê kurd in, nexasim di ber sînorê tirkîyê re û sê ol bi hev re têde dijîn: Misilman, xirîstîyan û êzîdî..

Di sala 1973 an de hikûmetê dest bi erebkirina Cizîrê kir û dor 33 gundên ereban ji dervî parêzgeh Heskê di nav kurdan de bi rûniştin dan. Hem jî, navê gundên kurdan bi navên erebî guhertin..


Ji navçeyên Cizîrê ji bilî bajarê Heskê ku parêzgeha Cizîrê ye: Serê Kaniyê (Raseleyn), Dêrika Hemko (Malikiyê) û Qamişlo. Ji bajarokên wê: Amûdê, Tirbespiyê (Qehtaniyê), Derbasiyê, Til Koçer (Yehrebiyê), Şedadî, Til Berek, Rimêlan..

Qamişlo: Ev bajarê ku hin jêre dibêjin **Kalîforiniya** rojhilatê, hin dibêjin **Parîsa** biçûk û hin dibêjin **Bûka** Cizîrê, di sala 1926 an de ji rex Fransîzan ve hatiye avakirin - Bi avakirina qijla leşkerî û seraya fransî re - li ser girekî kevnar di binya **Nisêbînê** de, bi dor 2 k.m an, di nav xaka ku weqfa ziyareta Zeynelabi-dîn e. Eva ku dikeve nivê Nisêbînê

de - Piştî ku sînor di navbera tirkan û deşilatdarên Fransîyan di suriyê de hat danîn, Ji bo restî bê gotin, di destpêkê de cihûyên Nisêbînê, siryaniyên Bagokê û ermenên ku ji ber tirkan revyayî bûn û kurdên derdorê bi avakirina Qamişlo re westiyane û xwe li dor xanîkê Qidûr beg, sera û qijleya fransî û çemê Ceqceq girtin, kombûn û xwe danehev û weha Qamişlo ji çend taxan, di binya Nisêbînê de hat avakirin wek: taxa, Siryan, Ermen, Aşûriyê, Cihûyan, Tey û Elî Fero (Xerbî) di gel gundê Hilêliyê ji baxerb ve û Enteriyê ji bareş ve.. Roja îro ji sedî 70ê ji tevgera wê di destê kurdan deye wek: Bazirganî, çandinî, perwerdekirina di dibistanan de, Bijîjkî, Avokatî, Endezyarî, avakirina avaniyan..

Ji cihên navdar di Qamişlo de: Gora seydayê Cegerxwîn, Mihemed Şêxo û goristana welatparêzên kurdan li gundê **Dugirê** ku ev qehreman têde hatine veşartin: Hemze begê Miksî yê ku kovara Jîn di sala 1918 an de li Stenbolê di weşand, Hacî Mûsa begê, Dr. Nafiz beg Zaza, Dr. Qasim Cemîl paşa, Arif beg Abbas, Silêmanê Ebês, Haco û kurên xwe, Ebdulrehmanê Eliyê Ênis..hwd

Hem jî gora Osman Sebrî li gundê Berkevîrê ye û gora Îbrahîm paşayê Milî li Sifeya ye.



Dor 12/13 partiyên kurdan yê siyasî li Cizîrê hene, niv veşartîne, her yek ji wan rojnameyeke wê ya demdemî bi zimanê erebî heye, hin ji wan kovarên wan bi zimanê kurdî jî hene, wek kovara Gelawêj, Pîrs, Jîn, Gulîstan, Stêr, Xunav.. hwd, lê mixabin tu navendên kurdan yê çandî nînin.

Navê Qamişlo, ji Qamişê hatiye girtin, ew qamişa ku li ser peravê Ceqceq bi pîrbûn şîr dihat. Roja îro çemê Ceqceq Qamişlo dike du par:

Rexê Xerbiyan û rexê Aşîtan. Hejmara daniştîyên wê 168,369 hezar kesin ji bilî kurdên bê nasname ku hejmara wan di ser 300,000 kesî re ye, û kurdên ku navê wan nehatiye tomarkirin.

Û wek ku diyare Qamişlo bi rûdana 12 azara 2004 an navdar bûye..

Di baweriya min de, Qamişlo ji bajarên kurdan yê ku hejmara bijîşk, avokat û endezyarên kurdan bi pîr bûn lê dijîn û kar dikin..

"Moschophoros" (carrier of calf/barkêşê golikan)

Jordan

Kurdên Colemêrgê (Hekkarî) yê ku li der dorê Wanê bi cih war bûne, çîyayên wan pir bilind û asê ne. Naxirên wan nikaribûne hilkişin ser çîyê. Ji ber wê yekê, wan golikên xwe hildigirtine ser millên xwe û dibirine li ser çîyê dihiştine, ji ber ku li wir çêre pir bûye.

Ev gotinên jorîn di pirtûka Georges Perrot a bi navê, *Les Kurdes de l'Haymana (Kurdên Haymanê)* da derbas dibin. Perrot jî ev gotin ji pirtûka Amédée Jaubert a bi navê *Voyage en Arménie et en Perse (Seyhata Ermenîstan û Iranê)* wergirtiye.

Ev heykelê bi navê "Moschophoros" (carrier of calf/barkêşê golikan), di sala 1863an da li Akropolisê (Atîna) hatiye dîtîn. Lê di binê vî heykelê da hatiye nivisandin ku ev mirovê ku golik li ser millên wî ye ji bo Xwedayeka ezmanî dibe ku were qurbankirin.

Ev li Yunanîstanê di musexaneyê Atînayê da cih digire.

Çavkanî: Amédée Jaubert, *Voyage en Arménie et en Perse*, p.140 et Georges Perrot, *Les Kurdes de l'Haymana*, p. 614, note 1.



Kaç Co kaç

Uske Cimik

Navê kuçikê min Co bû. Hûn dizanin, Fîlmekî Amerikî hebû, min pir jê hezdikir, navê film ,Kaç Co Kaç' bû. Loma min navê cewrikê xwe kir Co. Carnan, ez qala Coyê xwe dikim hîn kelogirî dibim. Nêzikî çel sal derbasbû lê min hîn ew birnekirîye.

Coyê min ne dûlekî guran bû, ne jî kuçikê CIA ne jî yê FBI yê bû, ev dûlê delika devreş, bavê wî jî li gund bi nav û deng bû. Ew kuçikekî nêr û no bû. Lê paşê ew har bû. Coyê min jî mina dayîka xwe devreş, mina bavê xwe jî no derket. Min carnan, qelmûska boxazîçî li nav pirça wî ya kêremîtî dikir, di pirça wî dida, bîn ve ser gund diket. Wextê di nav gund de birêvedîçû, cîranan ê bigotana, "magî, mînak jî herba yunên derketîye!.."

Min ew hîn çavên xwe nepîjkî ji ber dêlika devreş girt. A rast, min ev bi dizî li ber girt! Dayika min digot; *gune ye, ê zû bimire!..* Lê ew nemir. Min ew bi şîr û bîskûta girikir. Birayê min hîn biçûk bû, şeş mehnî hebû, hîn li ber mêjandine bû, min şîr û bîskûtên wî ji ber digirt dida Coyê xwe. Min digot, ew dixwe, ma Coyê

min bixwe. Carnan jî min ji devê wî emizik digirt, dikir devê Coyê xwe. Herdûyan jî dikir, maça maç. Coyê min ji serî şuştûne jî pir hezdikir. Kî heznake! Jinên gund serî xwe bi gilê dişuştin, min serî Coyê xwe bi şampona *elîdore* dişuşt.

Em li bihare diçûn yaylê, Yaylê Malê Taşkê. Wexta ku sarbûna hewan jî em dihatin Kîşle (Gund). Coyê min hema hema li yayle girbû. Wextê em dihatin gund, Coyê min heftek du hefta diket deprasyoneka mezin. Kuçikên gund xwe berdidan hesp, araban. Xwe berdidan komyonên sor. Co qet ji wan fêhm nedikir ku van çima xwe berdidin komyonan. Lê heftekî din şûnda Coyê min jî ningê xwe li ningê wan girt, ket dû wan, sifte xwe berda komyonê sor. Herî diçû tiştî neçê, tiştî xerev hewîsî. Şev-ro li cem wan bû. Li yasînan dihat mal. Li yasînan xocî camîye bang dikir, *Allahu Ekber* wê re jî Coyê dikir, zûre zûr'.

Berî her tiştî, Coyê min pir pakil bû. Min wî re digot; Co here! Ev diçû, min digot; Co werê, ew dihat, min digot; Co, merhaba! Coyê min li ser qûnê xwe rudinişt, ningê xwe yî

pêşîye hildida û dida min. Coyê min bi Tirkî jî hinek fêhm dikir. Dayîka min ji nîvanan hez nedikir, nedixwest me her ro werin malê me. Lê Coyê min, kî li ber malê me re derbas be, bi devê xwe di tûmanên jinan re, di fistanên keçikan re, di destên mêran re digirt, dianî hundirî malê û bi xwe jî li ber derîyê malê mexel dibû.

Coyê min ji pez çêrandine hez nedikir. Wî ne dixwest bibe kuçikê şivanan. Qûn nedida ber îşekî. Berdûşekî serbixwe bû. Min carekê Co vê xwe re bir berx çêrandine, se-atek nebû, xwe da ser tûmekî, qûna xwe çexe min kir, berê xwe jî dabû gund. Î here gund, berdilka xwe bînke. Dilê xwe ketibû delika Malê Hemê. Ez bi êşîyam, min go; Co here. Xûde! hîn şora min di devê min de bû, Coyê min tos dûman li ser xwe xist.

Rokê! Ax ew roka, nexwezim me ew roka were bîra min. Coyê min xwe ber dabû jinekê, ew birindar ket û heftekî ket nixweşxanê. Li ber mirinê bû. Gundek rabû ser xwe, lome, li me kirin. Gotin; vî kuçikê jî gund derxînin! Bavê min çû cem Racê Omişê. Wî re got; me ji vî heywanî xelaske!

Li gund Racê Omişê awcîyekî (nêçîrvan) bi nav û deng bû. Rokê,

Racê li awê cikê re deh ordek li erdê xistin. Rokê, li gûnd ro hatibû girtin, herder şevûreş bû, gûndî jê pir tirsîyan, digotin; cîn û pêriyan ro girtîye! Me jî *tenekên vîte* dikirin destên xwe, pê teqûreq dikir ku ma cîn û perî ji ber ro herîn. Racê Omişê jî bi çifte ro nîşan kir û dû caran teqat.

Racê çifta xwe de omûze xwe, ez û Co jî ketin ber wî, çûn hêla çem. Ro hema hema diçû ava. Ji dûre de firîskîyên şivanan dihat. Coyê min î delal! li dorê min û Racê boçe xwe bi kêfekî ba dikir. Hey heywan! de tu gezdikî gez ke, çima tu we derî jinikê gezdikî. Racê ji cixarê xwe nefeseke kûr kişand, wê re jî herdû bilivane re, ji dev de dûmanek berde ku minak tu bê *‘kara tren’* derbasdibû.

Paşê, Racê ji berîyên xwe du fişeng derxist, da devê çiftê. Racê li min mehskir, êpî mehskir. Serî xwe ji min re hêjand. Min ji Co re got, bi dengêkî kelogirî, ‘Co rûne!’ Coyê min li ser qûnê xwe mexel bû. Min destê xwe da serî wî, ji re mist da. Wî jî destê min bîn kir û alast. Ez ji wî dûrketim. Li paş Racê dawestîm. Sîya Racê li roava çiqas dirêj û bi xof, xoy dikir. Paşê, nizam paşe çibû? Teqînîyek li ser dilê min ket.

ŞOPÊN DEMA XATIRXWAZTINÊ

- V -

Nuhê Hecê Malê Herşîd

Peyabûna li bajarê W.

Ji seferêke bi tîranê ya ku sê û çar rojan ajotîbû bi şûn da, li dawîya meha îlonê, Simo û Homer li bajarê W. yê Almanayê peya bûn. Bajarê ku birayê Simo Hesên û birêk hemgundiyên wî yê mêr ji pênc û şeş salan vir da lê dijiyan. Di ser hatina Simo ra sê û çar roj derbas bûbûn. Ji ber dirêjîya rêwîtiyê û bandora sêra dîmen û nexşên warekî yad westiyabû, lê wî ev li xwe ar nedikir.

Ji hêlekê da jî hemgundiyên wî her roj li mala brayê wî, sewa xêrhatinê, li serî wî digihêştin hev, jê rewza mal û mermaliyên xwe yê li gund dipirsîn. Mîna ku ji xwe ra kiribûn edetêke mêvanperweriyê, wan Simo deweta malên xwe dikirin. Simo dewetên wan qebul dikirin, bersiva pirsên wan didan, silav û temeyên mal û mermaliyan wan digihandin wan.

Rojekê civata mêran li mala brayê Simo gihêştibû hev. Mal di qatê zêmîn yê xaniyekî li ser sê qata bû. Tenê odeyêke mezin bû û tê da brayê

Simo û sê hemgundiyên wî diman. Dezgehê malê tevhev du cot karyolên li serûbin hev ji bo raketinê, du dolab û li ser her dolabekî cotek bawil, li nava odeyê maseyêke çarkoşeyî û çar kursî bûn. Kuncêkî odeyê jî bi şekla nîvdiwarekî textinê wekî şûna aşxaneyê hatibû cihê kirin. Li wir ocaxekî ceyrani li ser maseyêke hatibû bişun kirin. Bi ser mabeyniya piçûk va hemam û abdestxaneyek hebû...

Koma hemgundiyên Simo yê li bajarê W. gîşt mêr bûn. Salên wan di navbera 25 û 35an da bûn. Homer bi Hesên va salmezîne komê bûn. Jiber ku ew di ber yê din hatibûn Almanayê, di derheqa jîyana li Almanayê da bi tecrube dihatin qebûlkirin. Rabûn û rûniştinên hemgundiyên Beraniyê li vir jî kêr û zêde, li gorê hîyerarşî, tore û şîretkariyên eşîrtî û gundîtiyê bûn. Li gore vê, li civata mezin deng di-kin, piçûk jî pirtir guh didin ser wan. Pir cara, kîngê ku ji piçûkan tiştêk tê pirs kirin yan jî pirseke wan hebe,

ew deng dikin. Tenê Meço li gore edetan tevnedigerî, ferdî hereket dikir, şorê xwe nedîvîşand. Lewma ew li ba yê din wekî yekî ji rê derketî dihate dîtîn. Simo jî, ji ber ku ew î xwendekar bû û qedra kesên xwendekar bilind dihate girtin, serbest hereket dikir.

Nîvê mêvanan li ser karyolan rûniştibû. Simo çay li wan belav dikir û bi pê bersiva pirsên wan didan. Di nav civatê da, ew bi salan yê piçûktir bû.

Homer dikete rû Meço, qala berdûşî û serhatiyên doxinsistiya xalê wî yê li Anqereyê, Kirto dikir. Wî bi yareniyan civat bi kenandin dida. Meço, mîna ku xwaztibe mijar ji ser wî û xalê wî rabe, berê xwe berve Simo kir û ji ber ku guhên xwe kêmbihîztin, bi dengê bilind got:

- Simo, xwaz bi te, te rind kir ku tu hatiyî Almanayê. Tu yî cîwan î, waleh va dera xercê te ye. Ku te dest bi xwandina li zanîngehê kir, tê li wir di nav horiyan da bijinî. Meraq dikimê ku bizanim ka Almanya bi te çing hat û çiyê vira bala te pir dikşîne?

- Mîna ku bibêyî ez ji dinyake hatîbûm dinyake din. Ku bi rê da diherim, ez î matmayî û bi çavbelî li der û dora xwe sêr dikime. Ji diyarê deşta Anatoliya rep û rût, betal û

xewle, ziwa û ron, pirtir bi rengên zer, gewr û qehweyî pêçayî, hatime warekî tijî dar û daristan, kêmronekî bi rengên heşin xemilandî. Deng û awazên ji zimanekî yad yê ku bi meriva hîşk û bêhemahengî, mîna teperrekeke nenas tên. Warekî ji her alî da avadan, bi nîzam û duzan, bi çûyîn û hatinên bi lez û bez, bi cade, meydan û rawestgehên pak, bi hewlîyên mezin, bi sarî û sermayên bi tîn yê destî sibê.

„Wekî din çi pir mêmîla te kişand?“ Meço careke din pirs kir. Homer xwe avête navberê û got, „Simo, yanê Meçoyî dixwazê ku tu jê ra qala jinên por zer û çavkesk bikî!“ Simo bi rûyekî biken lêvegerand û got:

- Leza ku jîyan û zemên pê diheriqe bala min kişand. Deng û bangên ku ji alav û dezgehên endustrîyê dertên. Dengê çirkiniya hesinan yê ku ji frenkirina tîranê derdihê, dema ku tîran nêzikî rawestgehê dibe, meriv pê vediciniqe. Min dizanî û di film û resiman da dîtîbû, lê zîndî û ji nêzik va dîtîna evqas mêr û jinên bejndirêj, ten sîpi, çavkesk û porzer yê ku em, çîma ku li ba me pir kêmin, bi hewêsê ne, bala min kişandin. Serbestiya ku ew pê dihên û diherin jî. Tişteki din jî bala min dikşîne, ew jî guhêrtina we ya fizîkî ye. Hun, merivê gundê me yê li wir, çîma

gîşt wer bûne, bizara yên li gund, hun ê pan bûne, bi ser hev ketine, mîna ku bibeyî hun ê li wir ketine besîyê. Yek jî, hun gîştê gewr û zer bûne! Ten û tonê wê hatiye guhêrîn!

Li gundê Beranî jî pir cara qala vê mijarê dihate dikirin. Di derheqa guhêrina fizikî ya mêrên li Almanyayê, goşt girtin, gewr û zer bûna wan da digotin, „ goşt girtina wan neçê ye, sist e, pûç e, mîna ku bibeyî, ew ê werimî ne û bi zerikê ketine!..“

Bi ser gotinên Simo da, Meço bi lez û dengê bilind got:

-Gewr û zer bûna me ji rojnedîyînê tê. Li vî welatî roj zaten kême vedine, ewr pir in, ewr. Bi ser da, em ê tim di hundur da ne, geh li mal in û geh jî li fabrikayê ne. Carna em heftekî rûyê rojê nabînin. Em ê carna 12 seetan dişûxilin û xişehal tîna mal û cihlê xwe bi kinca va diavên nav nivînan, ne rûye derva û ne jî yê rojê qet nabînin. Dan bi dan şuxilîna jî tesîra xwe heye. Gava ku em danê êvarê yan bi şevê diherin kar, em ê bi ro radikevin û lewma rûyê rojê nabînin, nizanin ku roj ji ku derê da heltê ! Yek sebeb jî xwarina me ya li vira ye. Em ê tim goştê mîrişka dixwinî, lewma benz û bedê me mîna çermî dor kûnê mîrişka bûye ! Yek jî em ê xwe pir dişonî, di pey her karberdanê

va, em ê li cihê kar sere xwe dişonî. Mecbur in, çinkî her dere me tijî toz û rijîya hêsin, polad û komirê dibe. De, di bin van şert û mercan da, tu ê gewr û zer nebî, lê çir bibî!

Bi van şor û mitaleyên Meço kenekî bi mêvan û guhdaran girt, bû “hekehek” û “hikehîka” wan. Xwedanê malê, Hesên, mina ku ne bi dilê wî be, Meço zêde deng bike, berê xwe berve wî kir, got:

- Meç Meço, van tiştên ku tu dibejî, eger rastî tê da hebe jî, ne ji bo te ne. Malneketo, tu kingê şixuliyî, tu î ji heftekî carekê “krank” (nexwaş ketin) dikî û şeş meha carekî jî firmayê diguhêrî!

Hîn Hesên gotinên xwe bi dawî nekîrbû, Homer cîhlê bi çend gotinan Hesên tesdîq kir û got:

- Meço yî pir cara wextê xwe li qe-hwexana û bîraxana, li ba pîrejinên alman derbas dike, lewma ew î rûyê rojê nabîne!

Di pey van gotinên Hesên û Homer va dengê kenê civatê hîn bilindtir bû. Ji terkîna kêna bişûnda, Mestê Alê, bi dengê nizm û tevgereke bi xwe ne govan û hurmetkar teve sohbetê bû:

- Bibaxşînî, şor li piçûkê mina min nakeve, wê rojê, çiqas raste nizanîm, tercumanê fabrikayê me got, “biserhevketina me ê ji avûrûyê xwa-

rina nanê bajêr yê sîpî û pûç da û ji pir vexwarina colayê ye!” Têdahatiye colayê şîrîn û xwaş e, mina şerbetê ye, ku te vexwar tu jê têr nabî!

Heval û nasên Mestê qala xas-mendiyên wî dikirin. Bi heldanên wan Mest pir dişuxiliye, rojên şemî û yekşemiyê jî. Li rawest û navberdayînên ji bo vêsîn û xwarinê jî dişuxiliye û mal û milkê fabrikayê mina ku yên xwe bin, diparêztiye. Remoyê Heyder jî pir bîra keçika xwe ya çar salî dikiriye. Keçikeke cîranê wî yê italî di salên keçika wî ra hebûye. Ew bi simayê li keçika wî çûye. Her ku Remo raste wê dihatiye, cîlê çav şil dikirine.

“Na lo, tercuman bi çi dizane, ku weng e xerê, çima ez goşt nagrime, ne ez î, ku nebû eyb, her roj du şîşe cola vedixwime, mina ku dibên, xwe bi colayê dikûjime!” Remoyê Heyder li Mestê vegerand.

Li derengiya êvarê, mêvan belav bûn. Meço li ber dêrî bi Simo ra got, “ez î sibê betal im, ku tu jî bixwazî, ez ê warim ba te, em ê tevehev herin nav bajêr. Ez ê brayê xwe tenekê bigerînim, şûn û warên rind bi te binimînim!” Simo serî ba kir û pê ra jî bi dev got, “erê, çima nabe, a pir rind bibe!”

Bi sohbet û dengkirinên civata mêrên Beraniyê li W., meriv têdigi-hêşt ku ew gîşt di holik û fabrikeyên

ku berhemên hesin û polad derdixin da kar dikine. Bi dest û pîyan û bi milan karên giran dikine, bi gotina wan, di nav ar û alafê, toz û dûmên da dişuxiline. Xem û xeyalên wan, pir û hendik mîna hev bûn. Pênc û şeş salan kar bike, bi lez perene pir bihevghîne û vegere gundê xwe, li wir kamyon yan traktorekî xwe bîstine! Gurbetî li wan pir bi qahr dihat. Wan bîra gund, jin, zar û zêç, hezkiriyên xwe dikirin. Ew Bi hesreta vegerina milkê bav û kalan dişewitîn.

Dora dina rojê, Meço hat Simo helna, ew tevhev çûn nava bajêr. Li nava bajar pêçekê bêdeng geriyar. Dengê çane dêrê bêdengiyan wan birrî. Dengekî gur, Simo pê veciniqî, li dorûpaş xwe mêz kir. Ew di nêzikî dêrekê ra derbas dibûn. “Çi girminiyeke bi tîn û bi xof e, nizanîm bi te çing tê Meço!?” Simo got.

-Erê lo, bi min, wexta ku ez hîn nû hatibûm, va girminiya mîna “gimemim” a ku ji ser xaniyê hesinkarê gund heldihat û yekcaran jî mina dengê “dankutana” jinan dihat.

Meço Simo bire qehwexaneyê li firoşgeha Hortenê. Li wir destpê sohbetê kirin. Pirtir Meço deng dikir, Simo guh dida ser. Mijar çerx bû hate ser qazindê Meço yên ji hemgundiyên xwe.

-Ez î xêrnedî me, ku diherime

ku derê, li wir di pey min va, zema min dikin, serhevdeyan li min dikin: „Meçoyî vir û derewan dikê, Meçoy ketiye pey pîran, pîrê Meçoyê vê didan in, ku destî meriva ges bikin, xwîn jê nahere!..“ Yen ku vana dibên, gî hesud in, xêrnexwaz in. Qamê meriva dişkênin! Malneketno, hay jê ne ne ku ez î rindiya dikime! Tê da hatê, tecelliyê neçê ye, nav û dengê min ê neçê derketine, rindiyên ku ez dikim li ba xelkê mîna xerabiya têne hesawkirin. Halbukî ez î tişteki xerab nakime, xêran dikime, bi pîr û jinebiyan va hevaltî dikime, wana şa dikime! Hewênîya wan bi min dihê, ew ê li min dua dikine! Dîşliqê me î bi hev dihê, em ê hevdu aşt dikine! Ew jî mîna min bi tenê ne. Bavpîrê

min, Xwedê emrekî dirêj pê de, di ser ra xêrxwaz tunin, xwe di ber gîştkan digihande hawarê kesên di tengiyê da. Wî ilmê tengî û tenetiyê rind xitim kiribû. Wexta ku hawara almana gihêşte gund, bavpîrê min got, „kurê min rabê, dameweste zû here hawarê almana, çir dikî bikê, rê lê bike xwe bigîhine warê almanan. Merikan di tengiyê da ne, çûyina hawara wan xêrek e!“ Min bi gora wî kir, ez hatim. Ji jin û kurikan, ji germî u ronîya gundê xwe dûr, li memleketekî sar û tarî, tê çir bikî, tê bi çi hewênîya xwe bînî û xwe aşt bikî? Ku hembeza jinebî yan pîrejinekê be jî, ma ew bi te xwaş, mîna kendalekî germ naye?

Almanya, 03.01.2014

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di *Bîrnebûnê* de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

XOŞEWÎSTA LÊVFÎNCAN

Xîzan Şîlan

perdeya cama sirên veşartî
ji zingezinga zengilê dilê te re
vedikim
ji parzûna hesretkêşiya te
êşa rojên tevîzî
dipale
bi lingên şemitok
li dor xweşikiya bejna te
semahê digerînim
rîtma dilê xeşîm
di tîra bijangên te yên tûj de
serûbin bû
hespê xwe yê kumeyt
bi çargavî ber bi xeyala te ve
dibezînim
li xilmaşkiya xewnan
bêhna porê te ya qurnefilî
mizdidim
di noşîna meya eşqa te de
sergêj û sermest li dor xwe
dizivirim
bedena reben
li ber lêdana qamçiya ebrûyên te
tarûmar bû
qirika helbesta tazî
li ber çemên rûyê te ya nûranî

ji tîna qewirî
demsalên îlegal
ji hêlîna sebirê firar kirin
dûmanê cixara xemkêşiyê
di xwîna laşê min de
hate meyandin
zeviya daxwazên şîrîn
hişk û ziwa bûn
hezkirina min
di kemîna konê pîrikê de
dîl hate girtin
hêlekana dergûşa hêviyên min
dernixûn bû
tu
di keserên giyana min de
kewa guliyên spîndara yî
xemla rondikên bûka piştperdê yî
çirûskên tendûra temenê xemgîn î
tîrêjên keskesora êvarên bêdeng î
ez
wêneyên siya awirên te
di albûma hinavên peritî de
dicivînim
ji bedewiya hinarikên rûyê te
lezeta ava kewserê
vedixwim
ji bişîrînên lêvên te yên qedîfe
şerbeta şadiyê dadiqurtînim
xunava kulîlkên hewşa te
di êşa qolincên xwe de
vedişêrim

bêrîkirinên te
li ser balgiya qefesa xwe
radimedînim
di fala fîncana destê te ya narîn de
li çarenûsa xwe digirim
birîna kul û kederên salan
bi germa henasa te
dikewînim
were bibe
stûna nav mala wêran bûyî
periya îlhama hestên sêwî
dermanê westîbûna çokên qerimî
melhema qêrînên gewriya şewitî
stargeha qefilandina canê cirifandî
lihêfa bêxewiya şevistanên newêrek
û bibe
şewqa fanûsa odeya tenêtiya min

2013-05-10

Stockholm

Ey mirovê virek

Xizan Şîlan

Ez û tu berî deh mîlyon û bi mîlyaran salan, berî deh hezar û sed hezar salan... berî neh mehan û neh rojan, berî rojekê lê ji neh mehan carekê... li asîmanê, li ser axa cîhanê lê ne axa min, ne ya te, ne jî ya wî... doh a me bû, îro jî ya me ye. Ya me hemû mirovan e, ya bav û dayika min û te, yê pîr û kalan e, bi hev re bi hezar salan wekhevî li ser jîyan e... te bi destê xwe parçe parçe kiribû axa cîhanê, weku şekek mezin li nava serê cîhanê xistibû, kul û birîneke kûr û fireh di kezeb û dilê cîhanê de vekiribû... axa cîhanê li te hêrs dibû, lewra te axa cîhanê parve kiribû di nava xwe de, lê ne wekhevî... carek were binêre xweza çiqesî dewlemend e bi libên geniman, lê ev çi tazî û birçîbûna zarok û belengazan... der û dor tijî bûn bi ava lehî û robar û çeman, lê ev çi tî bûn û mirin û ziwabûna lêvên qelişî... ez gelê kurd, netewa kurd, te azadiya

min girtibû ji destê min, axaftina serbestiyê qedexa kiribû li min, lê te nema dikarî tune bikira hebûna zimanê min... te li ser axa min jîyan herimandibû li min, axa ku bi hezaran salan li ser dijîm, lê te ew axa nema bigirta ji destê mirina min, ew axa ku laş û giyanê min pê hatibû nixumandin... te ew axa nema bigirta ji destê tirba min, ew gora ku cendek û hestiyên min yên bêlivok û bêjîndar di nava dilê xwe de veşartî û parastî... te ew kevira nema bika-ribûya rakira û tune bikira, kevirê ku li ser gora min hatibû danîn û nasnameya min li ser hatibû nivisandin... goştê laşê min dê bihele, bibe tovê hêşinahiya kulîlk û daran, bi hezar rengan yê dîsa zîl bide, can bide û bipişkive ji nû ve li ser sînga axa min, li ser çiya û zinaran, deşt û zozanan, dê bibe ava kanî û lehiyan û biherike di navbera newalan de... ez dergûşek çarmehnî di zikê dayika

xwe de, yek parçe bûm, lê ne çar parçe, bi xwîna canê wê germ dibûm, mezin dibûm, dest û ling û awirên min azad û serfiraz dileviyan, hawirdor digeriyan li nav dil, pişk û cîgerên wê... min hewl dida ji bo ku bigêhê meha xwe ya nehan, bibînim ronahiya cîhan, bijîm, bikenim, kêfxweş bibim di şadiya rojên aram de, wek bira, dost û mêvan ey tu însan, lê tu bûyî mirovkuj,

xwînmijê dirantûj, dijminê xêrnexwaz, tu bûyî kûçikê har û binar û çavbirçî... min hê negirtibû pêsîra dayika xwe, nemêtibû şîra dayika xwe, te giyan ji min kişand, gewrî û qirik li min fetisand... ez keç û xortê çardeh sal î, dayik û bûka bermalî, te bombe berda ser serê min, gulle berda sîng û berê min, mal li min wêran kir, can li min şewitand, mirina min ya bi hezaran, axîn dikişand bi keseran, li ser çiya û zinaran, di hundirê şikeftan de birçî, lingxas û tazî, li nav serma berf û pûgê û

di bin dilopên barana har de laşê min diqerisî, dest û pî ditevizî, giyan dilerizî... ji bo qultek av, pariyek nan, cotek meres, paçekî kiras, ji ber berjewendiya te ya aborî û rêzanî, hovîtiya te ya ne wek însanî, min fikir hawar û gazî, hawirdor dibezîm, ma tu çiqasî xêrnexwaz î, fêlbaz î ey tu mirov, ma tu canbaz î, lê tu ne li ser benê sîrkoyê, li ser axa min difirî û bi jiyana min dilizî... çiya, kevir û zinaran serî hildabûn, hembêza xwe vekiribûn û ber bi qêrîn û hawara min ve dimeşîyan, dengê wîçwîça çûkên ewran zikê asîmanê didirand, dar û daristanan porê serê xwe dirûçikand, dengbêjan kilamên şîna egîd û mêrxasan dilorand...

Ez ê kelepçeya zendê xwe bişkênim, zencîra koletiyê biqetînim, sînor û zîndanên rûreşiyê hilweşînim, tovên kulîlka azadî, aramî, şadî, bextewarî, dilxweşî û serkeftinê li ser bedena axa cîhanê bireşînim...

GULA ZER

Mam Recall

Çendek sal berê,
Destpêka Gulanê bû.
Pelik vedikirin ji nûve..
Hêdî hêdî..
Gav bi gav gul a zer.

Gav bi gav,
Dibûm temaşevanê gulê.
Ew hewce ya zozan û çiya,
Ez hewce yê rengê zer..
Dem bi dem gul a zer.

Dem bi dem,
Xwastinek peyda dibû..
Divê gul werin parastin.
Lewma bûm şivanê gulê..
Roj bi roj gul a zer.

Roj bi roj,
Qewî dibûn stirîyên gulê.
Êdî xatir dihat xwastin..
Firiyam wek pepûleyek hêvîdar,
Dîyar dîyar gul a zer.

BERF DİBARE

Medine Kerpiç

Berf dibare li ser xeyalên min ên ku hatine dizin
Mîna miriyên li ser sîya xwe digerin
Mij digirin hênînivîsên me
Berf dibare li camên vî bajarî
Teqîna gullekê
Bêdengiya tariyê xirav dike
Bedenek kerî kerî dibe,
Li ser kevirên sewkî yên bi herî
Û li pey hev pêva didin çavên tirsokî
Di bêdengiya şevreşkê da
Hêviyên me şerê namusê re têk diçin
Çirokê me li teregê dirokê yê xubargirtî de tèn nivisandin
Hal ev e ku ez berfînek di nav berfê da bûm
Bilbulekî li ber pencerê diqubî bûm
Beri ku ez bi vî derdi kevim
Dilê te de çirokek bûm
Qamişkê dor çema şaxvedayî bûm
Hê ku ez bi vê evinê, bi vê eşqê neketibûm
Teyrek bûm li serê çiyar difriyam
Di xumamiya sibê da
Gava gulrûyê te xwe berdida ser hundurê min
Pêl bi pêl bêhna cehtiriyê dihat ji dilê min
A niha tê birrîn mina şimakî hêdi hêdi bêhna min
Her car bi pêlan re digevize qefesa min
Û paşê li ser pozê dinamîtekê belav dibin biraniyên min
Dibe hesret, dibe koçberî,
Berf dibare li ser gulan, li ser bêtebûniyê,
li ser hêviyên min berf dibare...

12/12/2013, Wergera ji tirkî: Yücel Aslan

YARÊ

Medine Kerpiç

Ku avîya şevê dikeve pencera min
Dibe bêdengî ev bajar
Seqema çilleh xwe davê ser çavên te
Bi êvaran gulle dide barandin
Dilê min mîna pînekî ku ji ber pozê derziyê dirdirîkî bibe
Ji alîkî min tê bêhna hesretê, alîkî min mirin
Çavên te kemîn, destên te qedexe
Tu mîna laleke çîyayî, ez mîna serkînorekê
Şerê evîneke ku bi dilê min va zincîrkirî
Min tu kirî emir ey yar
Min çavên te da ji hêvîkî hizkir
Şerê min î qedexe de xeyal,
Zivistana min da bûyî bihar ey yar
Di her dilopeke ku ji şevê diareve da,
Bêhna ilemurê tê ji lêvên te
Di bayên payîzê da dişkê aliyên min î çepê
Vê ga qasî ilonê bêreng û tevlihev e rihê min
Kenxezal, awirhêşin ey yar....

27/11/2013

Wergera ji tirkî: Yücel Aslan

ÇÊROKA HÛT*

Amedekar: Nuhê Hecî Malê Herşîd

Çi hebûye û çi tunebûye, Hûtek hebûye. Wî meriv dixwarine!...

Hût dibihîze ku keçikeke malekê hebûye. Ew piçûka malê bûye. Yeka pir rind bûye. Hût dihere wê ji xwe ra dixwaze. Xwedanê keçikê jî wê li Hût mahr dikin û şûna cîz hespekî surre didine keçika xwe...

Hesp du mûyên xwe dide keçikê û dibê, „kîngê tu ketî tengiyê, van her du mûyên min bi hev bike, hîngê ez ê xwe bi te gîhînim!“

Mala Hût li serê çiyakî bûye. Hût bi jinika xwe ra dibê, „ez siwê diherime kar û êvarê vedigerim mal. Ew î malê bi ser jînekê da cîhdihile û temeyeke jî li wê dike, dibê, „odeyeka malê piçûk heye, nekeve wê!“ Jinik bi vê gotina merê xwe dikeve şikê. Rokê Hût dîsa dihere derva. Di mala xewle da, jinik dikeva odeya piçûk. Mat dimê, çi mêz ke, odayê

tijî cesedên bi darda kirî û hestiyên meriva ye. Jinik pir ditirse, mûyên hesp bi hev dike...

Hespê surre bi jînekê ra dibê, „Hûtê hîro me bixwe, em birevin!“ Jinik kincê mêran li xwe dike, dikeve asima mêran, li hêsp sîwar dibe û lêdixe dihere. Der bi der li cîh û warekî ku lê dewara xwe bike digere. Li gundekî, li mala pîreke ku bi lawikê xwe yê bi tenê va dimê dibe mêvan. Pîrejinê dilê xwe pê dişewite û dibê, „were li ba me bişaxile!“

Demek derbas dibe, pîrejin bi rabûn û rûniştinên wê dikeve şikê û bi lawikê xwe ra dibê, „va yî mîna jina ye. Em ê bala xwe pêdin ka çi cîsn e. Li dûv here û gava ku wî av rijand, mêla xwe pêde ka mêr e yan jin e?“

Hesp cîhlê xwedîya xwe derheqa şik û plana pîrejinê da heşiyar dike

* Min va çêroka li havîna sala 2013an ji devî xwarziya xwe, Figena Mircê (Ateş)bihîst û nivîsî. Teceliya berhemên folklorê kurda ye, ji ber bê an kêm xwedîtiyê ew ê di wexta xwe da nehatine berehev kirin û nivîsîn. Figenê ev çêroka di zaroktiya xwe da, ji dayika xwe, Mirca Hecê û dapîra xwe Fata Hecî Gulê bihîstiye û hevîsiye. Malesef, çêrok gişt nayê bîra wê. Li wir min hen bendên wê, veqasî ku di bîra Figenê da mayine nivîsîn.

û dibe, „di qamîşekî ra avê birijîne!“

Vê cara, pîrejîn ji lawikê xwe ra dibê, „gava ku ew bi darê da helkişî, tu jî di dûv ra helkişe û destê xwe biavê navranê, ka jin e yan mêr e!“

Hesp tavile xwedîya xwe heşiyar dike û dibê, kevokê bikûjê û li navrana xwe girêde!“

Pîrejîn ji lawikê xwe ra dibê, „wexta ku kete nav nivîna, here bikeve cem û pê ra bilize û bi destan li pêsihrên wî binihêre!“

Welhesil pîrê û lawikê wê tê tînin derê ku ew kesê ku wan ji xwe ra pale ragirtî jin e... Pîrê wê li lawikê xwe mahr dike.

Rokê lawikê pîrê dihere eskeriye. Jina wî bi ducana ye. Wexta xwe tê, ew cewiyan tîne dinyayê, du lawikên termîzêrîn. Dayika cewiyan ji mere xwe ra nameyeke bi rê dike, tê da mizgîna cewiyan dide wî. Namebir dide rê û nameye di bin şebqa xwe da vedişêrê.

Namebir, bi rê da diweste, li keviya çemekî gavekî xwe dirêj dike. Dikeve xewê. Hût di wir ra derbas dibe û namebir dibîne. Nameya di bin şebqa wî da dixwîne. Ew nameyê diguhêre, tê da şûna cewiyan, “du cewrikan” dinivîsîne.

Lawê pîrejîné nameya dixwîne û pê bi ber xwe dikeve. Ji dîya xwe

ra cewabê dişîne û dibê, “bukê bi cewrikan va biqewitîne!” Jinik bi cewiyên xwe va bar dike û dihere li dawîya gund di gomekê da rûdine. Arekî xwe dadide û bi zarokan va xwe li ber germ dike. Hût bi ser wan da tê û dibê, “ez te bi çîgî yan jî bi braştî bixwim?!” Jinik dibê, “min bi braştî bixwe!” Û di wê navberê da, ew mûyên hesp bi hev dike û paşê, sewê ku Hût pê nehêse, mûyan diavê nav êr. Hesp tavile tê û Hût dikûje. Çerxe jinikê dibe û jê ra dibê, “te mûyên min avêtin nav êr, lowma ez ê aniha bimrim. Serî min ê ji te ra bibe qonaxekê, tiştên nav zikî min ê ji te ra bibin cîran.”

Jinik bi her du kurikên xwe va di qonaxê da dijine. Kurik bê tirs gir dibin.

Rojekê bavê kurikan tê ser kaniyekê. Lawikekî wî li ser kaniyê hesp av didane. Hevdu nasnakin. Bav jê pirs dike û dibê, „hunê mêvana qewûl bikin?“ Lawik wî tîne mal û dike mêvan. Jinik tavile wî nas dike. Jê ra cotek cewrik dikeline û dide ber. Mêrik dibê, „qe cewrik têne xwarinê?“ Jinik lêvdigerine dibê, „ma qe jin cewrika tînin dinyayê?“

Bi ser vê da, jin û mêr li hev tèn û bextiyar dijîn.

Demêke xemgîn bû

demêke xemgîn bû
demêke kezêb şewîtîyê bû
demêke ku teselîyê xwe giran bû
canî min hevdu dixwar
ew wang

min du heftan li wî kerî yê miha ku
di kêlekê malê me re sibê û berêvarê derbas dibû temaşa kir
kerîyê pêz î wisa vestîya bû ku
eger şivên peşî nekişanda
pêz ê xwe li erdê bi tîr kira
havine dereng e
zevîyê hetine candînê
gulûgîyayî bûyê puşo
li wê germê romê rutik
tîrêjên rojê wek pêtîyên newalê gehinnom bûn
axê mina sêlê ser tandira germ bû
pêz li nav tarlên ku îsal hatina candînên
bi piranî serî xwe di kira berhevdu
û dikete qû yê
simên pêz dişawitîn
anahita anahita tu li kê dereyî
armaîtî, haurvatat û ameretat
we cima em ji bîrkirinî
ewrên sewirê derbas dibine
ne heşinayî ne jî keskayî
ne cemekî ku zelal û delal diherikê

ne golê ke ku pez bi hemdî xwe avê jê vexwa
û şivan lingên xwe têda vêhêsînê
tune
tune
elameşkerê tune
navê xwe yî li sere
roma rutik
insanên serî xwe hiltinine û ji wir koc dikine
lê wan heywanan ci bikin
parêzgerê şivanan mitra kuda wenda bû yî
ka deh hezar cavên te
ka deh hezar guhên te
rojakê ez cûm cem şivên
şivan jî wek pezê xwe westiya bû
li henîya wî heqate şivanan
li carixa wî xwelî û xubara cîyan û banîyan hezar salan
milên wî bi ser singe wî da helşiya
rîyê wî tevlihev
kulavê wî qut û dirî
bilûra xwe wenda kiri bû
zengil wek fermanê ka bi stû da mihan da dêwisti bûn
dengî zengilan mina senfonîya beethovenê penca dihat
deme ku ez ji ba şivên vegeyriyam
min li ser deriyê xwe
rovîyêki ku ro bi nivro
berve gund pazdide dît

Seyfi Doğan

Li yad

Heinrich Heine*
wergêr: Nuh Ateş

I.

Ew te dide ber xwe, ji derekê dibe derekê
Tu qet nizanî çima jî;
Ji nav bê tingîniya peyveke tînxwaş tê
Tu matmayî li derdora xwe dinihêrî

Evîn a ku li paş va maye,
Ew bane te dike bidilnermî:
Bi Xwedêkî vegere, ez yare te me,
Tenê tu dilşahiya min î!

De here, here, bêdawest,
Îcaze tune ku tu dawestî;
Eva tu pir yarê, pê dibûyî sermest
Tu nikanî carek din bibînî

II.

Hîro tu wer xemxwari yî,
Zû va ye qet tu weng nedîtîbûyî min!
Bi ser dêmên te da bêdeng tebrûsî,
Û keserên te deng didin.

Bibîr tinî tu war, yê ta li dûrê,
Mîna mij lêpêçayî ji te dûrketî?
Tê ji dil bixwazta, ji min ra rastiyê bibê,

* Heinrich Heine (1797 -1856) helbestvanekî Alman î navder e. Ew î ji binemale-ke yahud e. Heine Li yad maye. Li Frenseyê jî jîyaye û li wir jî miriye. Ev helbesta wî ya bi nave "In der Fremde"(=Li Yad) bi terza kafiyê hatiye nivisandin. Min jî vîqasî ku ji min hat, ew bi wê terzê wergerande kurmancî.

Carna li makwarê giranbiha bibûyî
Bibîr tînî tu wê xanima wenge narîn û banû
Bi hêrsbûneke sivik tu şa dikirî wê?
Pir cara ku tu hêrs dibûyî, hîngê ew aşt dibû,
Û herdem dikeniyan hun li dawiyê

Bibîr tînî tu hevalan, ên ketî
Li ser sîngê te, dema dijwar da?
Di dil da heldinan ramana serî,
Lê dev bezar dima

Tu dayîk û xwangê bibîr tînî?
Te baş debar dikir bi her duyan va.
Ez wer bawer im, serdilê min, ev dihêlî,
Wêrekiya heşerî di sîngê te da!

Bibîr tînî tu çûk û daran
Ên baxçeyê avadan, ku tu lê pircar
Xewnedar ê yarêbûna xewnên cîwan,
Ku tu lê dudilî, û hevîdar ?

Êdî dereng e. Şev ronî ye,
Şêliron rengkirî ji şîliya berfê.
Divê zû bipêçim ez xwe
Û herim nav civatê. Wey li minê!

III.

Zemanekî makwarekî min hebû.

Daraberî

Li wir dirûzt bejndirêj, binefşan nazik dihêjand serî.
Ew xewnek bû.

Wê bi almanî dipeyivî, û bi almanî paç dikirim ez
(Meriv qet pê qane nedibû,
çiqaş xwaş deng dida) peyva: „Yare te me ez!“
Ew xewnek bû.

SOHBETÊN MAMÊ (2)

Mam Recall

Hesenê Bilo

Êdî dawîya zivistanê û berê êvarekê bû. Ji derve da dengê qîjin û teşqeleyekê dihate bihîstin. Paşê hate zanîn ku, dilê xaltîya Edîle rawestîye û çûyîye rehma Xwedê.

Xaltîya Edîle rehmêtî him cirana me, him jî, mermala me bû...

Rûsipî û mezinên gund, ji bo serxatîyê diketin hundirê mala apê hec Nebî. Ez û çendek xortên gund jî, li derve disekin. Kek Hesen, ji min û hevalan sedema mirîna xaltîya Edîleyê dipirsî. Paşê, ji nişkave destê xwe avête rihê min û ez wiha rexne dikirim:

“Ev çi hale lo! Te xwe wek bizin’an kiriye. Gelo van rihên xwe yan bi temamî berde, yan jî kur bike. Wisa nabe eybe, walleh eybe. Qey em misilmanin.”

Miroveki piçek bihiş û aqil, ne bi Hesen re dikeve nav gengeşîyekê, ne jî bersivê dide wî. Wê gavê min li çavên xortan, xortan jî li çavên min dinêrî. Û wek digotîbûn; ‘kek Mistefa, dem ev dem e.’ Ez bi handera

(teşwîqa) xortan, ketim bin berpir-syarîyek mezin û min wiha bersiv dayîbû Hesen:

“Kek Hesen, li gora gotina gundîyan, bavê te xalê Bilo rehmêtî şevêkê li ber Xwedê digere û wiha dibêje: ‘Ya Rebbî! Tu xudanê erd û ezmanî. Wek tu jî dizanî ez kesekî xizan û belengaz im. Li gundan kar û xebat bê ker nabin. Kêmasîya min ew e; heyrana te me ji min re kerekê bişîne.’

Xwedê, dueya bavê te rehmêtî dibihîze û wiha bersivê dide wî:

‘Lawî hec Heydero! Dueya te, ji hêla min da hate bihîstin û qebûlkin. Ez îşev ji te re kerekî çê dişînim. Tu jî lê siwar bibe, bila gundî jî lê siwar bibin.’

Û ew şeva bimbarek, êdî dibe ‘roja dayikbûna’ te!

Bavê min Şêxê Bekirê Oxçî rehmêtî, ji bavê te jî xizantir bû. Em neh zarok bêşîr û bêxwarin, bûn. Ew jî li sala 1954’an li ber Xwedê digere û ji Xwedê bizineka bişîr dixweze...

Xwedê, dueya bavê min jî qebûl dike û bersivek wiha dide wî:

‘Lawî Bekirî Oxçîyo! Ez ji te re bizineka bişîr dişînim. Tu jî bidoşe, bila gundî jî bidoşin.’ Û wê şevê jî ez hatime vê dinyayê derew û alçax...

Kek Hesên, were em herdu jî qebûl bikin. Tu êdî kerek î, ez jî bizineka im. Ji vira ha, tu barî xwe, ez jî şîrî xwe ji gundîyan kêmanekin. Bila gundî jî piçekê rehet bikin lo!’

Wê gavê, ji devê Hesên dengê qirçeqirça diranan dihate bihîstin. Çi qewimî yan çawa bû welleh ez hina tenegehîştim, lê ya rast û dirist ew bû ku; wê êvarê, ez bawerim Xwedê dueya min jî qebûl kir û ez ji êrîşa Hesênê Bilo parastim.

Pîvana bawerîya min

Xelkê gund, li roja îdê bi awayeki hêja seredana malên hezinî dikirin...

Di wan civînan da; rabûn û rûniştina gundîyan bala min dikişand. Dîmen û tevgerên ku min lê temaşê dikirî, carinan ez hêvîdar, carinan jî dilşikestî û xemgîn dikirim.

Xatir zanin û hevdu pirsikin, mezîyetek pir giring û watedare. Li

rojên bi taybet, gelê kurd êş û janên xwe wek bi hevdu re parve dikir, li hevdu xudan derdiketin. Û bi wî awayî giraniya êş û janan sivik dibûn. Divê em li van çand û rewîştên xwe xudan biderkevin û wan baş biparêzin.

Xemgîniya min, ji çendek bûyerên nexoş pêkdihatîbû. Wek mînak:

Dema mêvan diketin hundirê odê, min li gora rabûn û rûniştina civatê dizanî ku, kîjan ji wan zengîn, kîjan ji wan xizanê gund e.

Û ji aliyê dinve; bûyerek balkêş mêjiyê min mijûldikir:

Gelo em kurd, çima ewqas bêdeng û neçarî! Çima em li hemberî hevdu dibin wek gur û şêr, li hemberî tirkan jî, psîkolojiya me tê guhêrîn û îcar dibin wek pisîk û mişk.

Vê rojê, bûyerek nexoş pêkdihat. Sê meleyên tirk qala tişteki dikirin û xwe bi xwe dikenîyan...

Min dixwest, mezineki gund tişteki bibê û dengê wan were birandin. Ji ber ku, em li malek hezinî civîyabûn. Û ji bo wê, tevgera wan qet nedihat qebûlkirin. Meleyên tirk; bi rewş û helwestên xwe, wek dilê civatê diêşandin. Min dît ku; tu deng ji gundîyan derneket, bi zîmanê tirkî min ji meleyan wiha pirsî:

Mam: Hayırdır sayın hocalar, ne oldu da gülüşüyorsunuz?

Mele: Kusura bakma birader! Sakal bırakmakla ilgili bir şey konuşuyorduk da!

Mam: Çok merak ettiğiniz belli oluyor, yardımcı olalım!

Mele: Gerçekten bu şekilde sakal bırakmanızın hikmet-i sebebini merak ediyoruz.

Mam: Evde bilgisayarınız var mıdır?

Mele: Hayır yoktur.

Mam: Olsaydı iyi olurdu. Neyse, kısaca sizleri şöyle bilgilendirmeye çalışayım: Benim sakalımın hikmet-i sebebi; iman ve itikatten kaynaklanıyor.

Mele: O nasıl oluyor yahu!

Mam: İslam dinine göre; sakal bırakmak sünnet-i seniyye'dir hocam. Gördüğünüz gibi; buradaki hacı amcaların iman ve itikatları tam olduğundan, sakallarını da tam bırakmışlar. Benim iman ve itikatım yarım olduğundan, sakalımın da yarım olması çok doğaldır. Görüyorsunuz ki; üçünüzünde yüzü maşallah pırıl pırıl. Sizler bir dinin temsilcilerisiniz. Bizlerden evvel, sizler sakal bırakarak sünnet-i seniyyeye ittiba etmelisiniz.'

Wergera axaftinê:

Mam: Ma çi qewimî melayên hêja, hûn ji bo çi dikenin?

Mele: Bibexşîne bira! Me ji bo rih berdanê gengeşî dikir.

Mam: Eger tişteki ku hûn zêde meraq dikin heye, em dikarin arîkarîya we bikin.

Mele: Birastî em sedem û hîkmeta rihên we meraq dikin.

Mam: Li mala we kompîtor heye?

Mele: Na, tune ye.

Mam: Ger hebûya, dê hîn baş bibûya. Ez dikarim ji we re bi qurtî rave bikim: Sedemê hîkmeta rihên min, ji îman û îtîqata min pêktê.

Mele: Gelo ew çawa dibe lo!

Mam: Li gora dinê Îslamî rih berdan şîret û xwestinek pêxamber e. Wek hûn jî dibînin; mezin û hecîyên civatê, rihên xwe bi tamamî berdane. Ji ber ku; îman û îtîqata wan tamam e. Îmam û îtîqata min zêde nine, ji bo wê min rihên xwe nivçe berdaye. Lê wekî xuya dibe li ser suretê we qet rih tune ye. Berî me, hûn rihên xwe berdîn ku; rûmetê bidin din û pêxemberê xwe.

Axaftinên Zarokan

Zarok gul, jîyan gulistan e...

Wek her kes, di dilêmin da jî cihê zarokan bi taybet û cudaye. Ji ber ku hezkirin, axaftin û nêrînên wan bêxilaf û bêderew in. Ew ne tenê gul, ew ferîşteyên bi rastîne jî. Di jîyana wan da tişteki veşartî yan jî serniximandî qet nabe. Mêjîyê wan, herdem pak û paqîj e. Dema ku em ji wan hezdikin, lewma dibin qurban û heyranên wan.

Ez demek dirêj, li bajarê Antalya-yê jîyam. Li wira keçikek hevaleki min hebû. Wan salan, hina çar an pênc salî bû. Rojekê, di navbera me da axaftinek wiha pêkhatîbû.

M: Keçê, tu ji dayika xwe pir hezdiki yan ji bavî xwe ?

W: Ez ji herdû yan jî pir hezdikim.

M: Helbet hemi zarok, ji dayik û bavên xwe pir hezdikin. Lê car caran yek ji wan, piçek zêde tê hezkirin. Ne wusa?

W: Himm! Na na, ez ji herdû ya jî wekhev hezdikim.

M: Keçê, dayika te jinek baş û bedewe. Lê bi qasî ku ez nasdikim, bavî te miroveki piçek çewt e.

W: Çima ?

M: Li gor a bihîstina min, wî bêarî rojekê bi ço li dayika te xistiye, ev gotina rast e?

W: Na na, welle te çewt bihîstiye apo! Bavî min qet li dayikê min nêxist, rojekê dayikê min bi kevçî li bavî min xistîbû!..

GIRÎNGÎYEK:

Numra kontoya me hatiye guhartin!

A nû ev a li jêr e:

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

SÎYARÊ TÊRIKA

Dr. Mikailî

Li nêzikî Enqerê, qasî dirêjîya riya rokê, dûrî Heymanê li ber hozikê heşîn û zer, li bin girîkî sor û bilind qasî 30-40 konî reş xanê dikirin. Li paş wana zindarên gewr û bilind û di nav zindara da jî qewar û şikevtên mezin hewûn.

Li nav hozê da darik çinarê, gir û fere sere xu ber bi esman va bilind dikir. Piraniya Kona di bin darê da wûn. Hînik ji konan jî li ber îna webûwûn.

Payîz bû, payîzek germ û bêdeng. Wext ber bi hêvarê wû. Jina şîrê beriyê hanîwûn û dikelandin. Hînek jina jî, ji boyî şîva êvarê haziriya xu dikirin. Çend zarya jî ji bo arî şîvê qirş û qal berhev dikirin. Kerîk heştir, qasî sed deve û hesp li palê mexel bûwûn. Çend kera jî xu di nav xaliyê da dirêj kirûwûn û hînek ji wana jî xu li ax û xaliyê war didan. Li ber kona çend kuçik çexdiwûn. Ewna li bende hestîya wûn ku ji ber şîva hêvarê bimînînin û bavêjin wana.

Çend xort jî li hespe xu siyar bûwûn û ketiwûn iddia ku, ka kî

ji wana zûtir û baştir li hêsp siyar diwi. Ji serî hozê da heta serî din hespe xu bera didan. Helekê da jî dixastin bi vê camertiya xu ra keçiki aşîrê bidin.

Qorik keçik bi kinci renga reng, fistani fere û bi firfir, li jor fistana da qutni, li ser wana jî qutikli wana wû. Li nava xu kembera zerînî yan jî zîvînî girêda wûn. Di stûyî wana da qor bi qor zêr hêwûn. Hîneka ji wan teşî dirêsandin. Di devî hîneka da jî benîşte kerengê hewûn û ew bi kêfikê dicûn. Çîrki çîrka benîştî wan heta zindara diçû û ji wir jî li hozê belaw diwû. Wana li xorti siyar dinêrîn û bi wan dikenîyan. Ên ku ji wana dilgirtî wûn bi fedî û dizika, di bin çava da li xorta mêzedikirin. Keçiki din jî bi halî wana qerfe xu dikirin û dikenîyan.

Bêdengiya kona bi dengî nehlên hespa hat birîn. Ji jor da meriya dûye komik siyariya didît. Keçika ew dîn, peşta bi meraq lê nêrîn. Jinên ku şîr û şîv amade dikirin, rawûn pê û sere xu ber bî siyarî ya va dirêjkirin. Ku siyarî herçik nêzik

kona bûn, şûna meraqê çîçik tirs jî hilgirt. Bi hajotina sîyarîyan wana lê fehm kirin ku wana pîrr jî ne ji bo dostiyê tên. Wana hema bangî zaroka kirin û wana kirin navî kona. Hînek jin jî beziyan nav kona û xort merên ku li du nivro, li dû beriyê westiya wûn û bîna xu didan ber xu, xeberdar kirin. Xortên ku li nav hozê hesp dibezandin, dîn ku komik siyarî tên, wana jî deste wan li ser şuri wan, ji bo şer, ji bo kuştin û mirine amade, hespe xu ber bi konî eşîre va ajotin.

Demek şûn va sîyarî gihîştin kona. Geme hespi xu kişandin, herder ji toz û dumane da ma, çav çava nedîdi. Sîyarîyekî li ber wana simêl bada û bi rû dirêj, ji hespî xu bi şatafatikê bazda ser erdê. Yekî bejn dirêj û reş bû. Li serî xu poşîk pêça wû. Li piştê wi di ew germa havine kurkek hewû, di zik kurk da qutikîkî sor bi zerînê çin bi çin li xu kirîwû û piştik li navê xu girêda wû, Xençerek pozik tûj û gir radawû bin piştîya xu. Kevana wî li piştê wû û heqîya tîra jî di hêlê da dadiliqî. Li hêla çepê jî şurekî dev fere û poz xar dirêj diwû. Li dû wi sîyarî e din jî ji hespê xu bazdan li dû wî dan sekinandin. Meriya dizanîn ku ew serê siyarîya ye.

Eşîr, Êl jî ji koni xu derketî wû bi meraq, tirs û xof li hember wana ziq bûwû. Li peşiyê mêre aşîrê, li dor wana Xorte wana di her salî da. Hema li paş wana jî jin, bûk û keçê wana xu war dîk kiriwûn, disekînin. Te ye bigota qey ku şerek derkeve, ye xu hema bavêjin ser siyaran. Amade, bêtirs, ji şer û xu parastina ra hazir! Wana bi çavî xu yî wek ar yek bi yek li va sîyarîyana mêze dikirin. Bi vî avayî eşîr li dora wana bûn helqe.

Dû ra, ji konekî ji koni din girtir û bi cil, ber û gelta hatiwû xemilandin da mêrikî kal derket û giran giran ber bi siyarî ya hat. Li sêrî kumikî ji kulêv hewû, li dorî kum jî poşîyekî ji evrişim warda wû. Şalikî tîş tîşî ji heriya bizina û li navê piştikî dîsa ji qumaşî helebê girêdayî wû. Di ninga da çarixa ji çermî komîşa û goreka rîsînî û zirav xanê dikir. Bê dengiya ro bi dengî wî yî dawûdî hat birîn.

Çaxa we bi xêr sîyarîno!.. Hûn bi xêr hatin! Keremkin çelqemasteka me vexun, di vê germê da ê rind bi!

Li ser daweta wî xort hema beziyan ji gema hespê siyarî girtin û her yekî hespik kişandin ku biwin wana avdîn û turî cê û kayê biserî wan va kin. Jin û bûk bi gotina serokî êlê

Hecîbram beg fehmkirin ku wana ye ji mîvana ra sîfrê amade kin û ketin telaşa wê. Zaro eşîrê jî bi meraq yek bi yek li sîyarîya dinêrîn.

Seroke eşîrê û sere siyariya hev vûdu hemêz kirin û li hêla hev derbasî konî wî bûn. Komik ji siyarî û mêrê aşîrê jî bi wan ra ketin zik kon. Merê aşîrê gî li herdû hele konî seraşîr li pê herdu dest li ber zik bihevra girêdayî û sere wan xuzkirî dawastiyar heta ku Hecîbram Beg û sersîyar di nav wan da derbas bûn û çûn li ser nîvîn û minderên ku li quncî kon da raxistiwûn, rûniştin. Dû ra sîyarîye din û mêre eşîrê li gor sal û meziniya wan yek yek rûniştin. Hundirî konî serokeşîr da li hercar dîwaran bi gelt û berê ççîn bi çîn lê hatiwûn darxistin. Hema li ser balîva Hecîbam Beg ji livayê bizina xalîkî çûk bi toltolika xemilandî hewû û li herdu alî wê jî du heqî didaliqîn.

Li erdê jî li herdu aliya dîsa Kulave dirêj û bi rengê sor bi avakî gula xemilandîwûn, hatibûn raxistin. Li ser kulava jî dîsa balîvên xalîkî ê ji ali Reşîya daynawûn. Navbera wana da tu tiştik tunne wû û erd xanê dikir. Li ber derî kon jî dîsa ji berek hatiwû darxistin. Du pakij (Xizmetkar) li ber dêri li

pê sekinîwûn û çave wana tim li Hecîbram beg û li herdû lawî wî Oso û mehê bûn. Ku wana tiştik bixwasta, tenê bi nêrîna xu ew didan fehmkirin. Paqij jî hema berda duçûn ku ka beg ji wana çî dixwazin. Ew yek cara Lêgan û misîn bû, li dû xwarinê, yek cara ji mîvana yekî hacetek xu diwû, yan jî çay, qehve dihat xwestin. Ji paqija yek bazdida diçû konî ku wek aşxane dihat bi karanîn û ew ji kevaniya ra digotin û dîsa dihatin şûna xu li ber derî kon digirtin. Ku jîna tişte ku wana xastî amadedikirin, dihanîn ber derî û didan wana, wana jî ew li mîvana belaw dikirin. Pêştî didan bêg û dû ra jî dirêji mîvanî herî kal yan jî bi xatir dikirin.

Ku Hecîbram li ser balîva xu rûnişt, sere siyariya jî rûnişt, dû ra ên din. Hûndire kon çîçik şerqa ro didayê, di herdu Qulan da dirêj diwû, diçû li çavî siyariyekî gir, reş û herderî xû bi pirç diket. Ew mêrikî pîrr xof bû. Bi lexistina tîje ro xofbûna wî hîn jî lê zêde diwû, ew dikir merivekî bi tirsê. Dû ra yek û yek mêra dev bi kuxikê kirin, kesî denge xu nedikir. Ew bédengîya bi dengî Hecîbram Beg hat birîn.

Mivanên ezîz hûn bi xêr hatini konî meyî fiqarî!. Insallah hûne ji

mîvandariya me dilxweş bin! Eger hûn li qusura min nenêrin; gelo min hûn rind nasnekirin, hûn kîne? Ji kîjan qabile yan jî ji Êlê ne? Ji ku tên û terin ku derê?

Bi rastî Hecîbram Beg jî mêrê aşîrê jî dizanîn ku vana sîyariyê Têrika ne. Wê demê, diz û eşqiya yên têrikî li wan deran pir bi nav û deng bûn. Lê wana li gor erf û edetên xu, nexwastin dilî mîvanên xu biêşînin û bikestînin.

Li du pîrsa xu wî sere xu bilindkir û bala xu da sersîyara û dû ra jî li meri din gerand. Meriya di wa nêrîna wî da bê tirsî, ji xu bawerî pirr zeled û eşkere didî. Serî siyara qala Hecîbram begê bihîstîwû. Wî dizanî ku ew kurdekî medrese xwendî, zane, ji xu xaş, destfere û bêtirs e. Dîsa wî dizani ku wî silahşore xu yî baş hene û bi dewleta Osmanî va jî eleqayekî xu yî xurt heyî. Ji ber ku wî li Stenbol ê xwendî wû û ji bo wê jî ji hukumati nasê xu yî baş hewûn.

Ew rawû pê sere xu ha niv berbi bêg xuz kir, herdu destê xu li ber xu va girêda û bersiva wî da; Comerdî mêra Hecîbram beg ez ji têrikiya, lawe Duman begê Hesên Beg im. Vana jî heval û meriye min in. Em ji bo karikî bazirganîyê bervi çîyayên Aydosan û bervi hêla çîyayî

Bolîyê diçûn. Ji ber ku hespe me û em westîya bûn, me kone we dîn û xwest bîna xu bidin berxu, hespe xu avdin, cekin û dû ra bi îzna we dîsa di rîya xu kevin. Em naxwazin tu zehmeta bidin we û aşîra we. Le me ew cesarete ji navdariya weya mezin hilgirt, hûne ew bêwextiya me bibaxşînin!

Wî dengê xuyî bilind û cetel hewû. Bejn dirêj bû. Serçavi xu ji li gor wî dirêj bûn simêlik nêbirî û neşekirî di ser levên wî da didaliqîn. Li hêla rastê li rû wî jî birînik kevn dirêj diwû. Ku wî qise dikir, çave wî yî çepê jî bi wî va dilîst. Hecîbram Beg bê livandin guh da ser qîsa wî, di konî wî da bêdengiyek hewû. Tenê ji derva denge zarya, heywana û yek cara jî denge kevaniya dihat ku ji bo yî mîvana di telaşa haziriya şîva da wûn. Herkesî sere xu li ber xu xuz kiri wû li benda şorê Beg wûn.

Beg got; Hesên Beg! Em aşîra Terika baş nasdikin. Me bi wana va çend cara meriti û xisimî çêkirîyî. Hîn ji dema ku em ji welatî xu yî berê, ji bo yî malbarkirina rawûwun em we nasdikin. Hûn camêr, şêrwan, bêtirs û xof in. Me kurmanca li hember qevîmê din tim ji we hawar xwestî yî û hin jî tim hati-

ni. Bavî we Dumo Beg jî nasberekî minî rind i. Hûn jî me nasdikin. Eşira Mikailiya yî kedîm ji doraliyê Bazidê me kone xu barkirin û bi gellek eşirên din va tevûhev em hatin Anatoliyê, welatî Romê. Ji bo ku em kerîyî xu biçerînin û berx û pezî niyêr bifroşin Stenbolê û bi pê idara xu bikin. Le wekî eşirê din em bi fermana padişahî Romê, Sultan Mahmud mecbur man li va derana bi cî war bin. Erê hesreta Bazidê û Welatî xu yi berê di dilî me da wek birînekê yî. Le çiqas heyf e ku em cardin nikarin bizivirin ser axa kal û bavan. Hûn jî wek me ne, qedera me yeke! Hûn bi xêr hatine konî min. Înşallah Xadê me li hember we nede fedî kirin û eme xizmeta we bikin. Mikailiya hîn tu cara li hember mivana ey rûreş nekirim!

Li dû şivê siyariyî we eme li kona belav kin. Tu Hesên Beg li konî min mîvan e. Li dû gotina wî kenek li rûyî mêra giştika peyda bû, ewna gî rehet bûn û her kesî bi î hêla xu va hevudu xêrhati kirin û dû ra jî meri Mikailiya yek yek rawûn û çûn deste siyariya toqe kirin. Ji wana hînika hevûdu berêda nasdikirin. Wana hevûdu hemêz kirin û paş kirin. Li dû silavkirin û xêratî kirinê her kes li şûna xu rûnişt. Hînek ji

mêran bi çend siyariyan va derketin derva û çûn hespa ce kin û biwin avdan ê.

Vana din jî ketin sohbetik xaş û kûr. Ew sohbeta wana demik şûnva bi hatina bûkikê hat birîn. Wexta şivê bû. Ew çend xorte li ber kon li pê disekînin, hema bazdan û dan dû bûke. Ji bo yî ku wana xarinê bikşînin hundiri kon.

Çend zarya hema ziniyê (sifirê) û paxirî tolkîrin anîn, hînek ji zarya jî yek cil û yek kursî anîn. Pêsta kursî daynan ser erdê, dû ra ew paca sifre avêtin ser û zinî jî li ser dirêj kirin. Sifrek li ber Bêg û Hesên Beg û çar sifre jî li dor wana daynan. Mêrgî li dor wana li gor salê xu û giraniya wana di nav civakê da li dorê rûniştin. Xortikê bejn dirêj û hînnû rû derketiyî, tasa şorbê û kevçiyê darikî anîn ser sifra Bêg. Li hêlê jî nane hişkava. Ew nana jini eşirê di payîzê da dipêtin, hişk dikirin û ji bo zivistanê vedişartin. Li zivistanê ji ew derdixistin, bi avê şildikirin. ew wekîna dîsa nerm diwû û te ye bi gote qey ew nana teze hatîyî patin. Dû ra jî çend xorte din şorbe, kevcî û nane sifre din anîn. Ew şorba dêw bû. Di zik ta dane kutkirî, maste hişkkirî hewû. Li ser jî rûne kal bi omaxê (kekik) sorkiriyî, rokiwûn.

Ew bîna wî rûn û şorbê nave kon tiji kir.

Ew sîyarîye ku ji rê hatine û ji birçîna newqa wan ketiwû hev, xu bi zorê digirtin. Le ewna mecbûr bûn li benda wana din jî bisekinin. Ku sifre gî hatin, Bêg duayek xarinê xand û got afiyet bi. Le herkesî dîsa çave xu bera dawû kevçiyî wî. Ku wî kevçiyê xu dirêj şorbê kir, li dû wî jî Hesen Begê, kal û pîri din yek bi yek bi dorê kevçiyê xu berra şorbê dan. Li dû wana ji e din. Di zikî kon da nika tenê denge kevçiya û firfira vexarina şorbê dihat. Mêra bala xu didanê ku zêde ji devî wan deng dernekeve. Ji ber ku ew di nav civaka mezina da pîrr eyb bû. Le hîneka ji ber birçîbûna wan, nedikarin xu kontrol kin. Li serî her sifrekê jî xortik disekinî. Ku şorba sifra xilas wû, wana hema tasa wan hildigirt û dibirin konî kevaniya, ji wir jî îcar şivek bi heruği hişkirî ber bigoşt û qompîra va hat. Li hêlê jî xoşav. Mêra ew jî li ber çav û ninga di qultikê da xelas kirin. Li dû wê jî ji bo yî her sifre li ziniyekê li ser pilawa dan berxik sorkirî û pilawa jî bi mihuj, kakil û çîra va amadekirî bû. Dû ye berxê jî hatiwû xaşandin û dawûn ser dên. Li hêla vê goştî jî xoşava çîra, pivaz û nane hişkava hewû.

Ku meriya li vê dinêrî, îşteha meriya wediwû, av ji devî meriya diçû xarê. Mêr gî dîsa li benda destpêkirina Hecibram begê û Hesen Begê dawastiyen. Li du destpêkirina wana, wana jî nane xu kirin pari û pariye xu bera goşt û dên dan. Herkesî ji ber xu dixar. Wana bi desta pari dikirin û dixarin le ti liye wana qe nediwûn rûn û nediketîn nav şivê. Kesî tu ecele nedikir ku, bira wana din newêjin ku wana qe nexarine, yan jî dunênedî ne.

Di hêlikê da dan bi goşt va pari dikirin diavêtin devî xu û dicûn, di hêlikê da jî bi kevçiyê darikî xoşav yan jî deve çelkimêst vedixarin. Hîneka jî pîvaz jî li dû wê gesdikirin. Kesî tu tiştik nedigot yan jî denge xu dernedixist. Dengkirina li cem xarinê li nav kurmanca da tiştikî bi eybê wû. Gere meriya hema bixara û ji sifre rawûya.

Wana di nav çend gava da ew berxana û pilaw jî gî xarin. Xortê xizmetkar wana jî hilgirtin birin û li do yê jî şîranî anîn. Kevaniye Mikailiya pîrr bi nav û deng wûn. Nave wana, şive wana heta gîhiştî wû idara Enqerê jî. Ku memurekî dewletê dihat va hêlana, dixastin li konî Mikailî biwûn mîvan û li vir bixûn. Ji ber ku wana dizanîn ku Mikailî him di

hêla pakijiyê da pîrr cindî ni, him jî kevaniye wana xaş şîva didin ser. Şîranî hat ku wana hêcîr û mihuj di rûnî kal da qewirandini û li ser jî kakil kunci rijandini. Mêra dîsa nanê xu kirin pari û bi wê ew şîranî jî bi îstehika mezin xelaskirin. Di nav kurmanca da şîv li dû xarinê hindik jî di sehenê da dihiştin. Ji bo yî bira wana din nefikirin ku wana heta nika qe tu tiştikî wakîna nexarini. Le tehma va şîvana fedi û heya jî navberê rakiriwû. Wana çînik gi bi nê biriqandin!

Li dû xarina şîrênî sifre bi avakî lez û bez rawûn, sizik, serbirge hatin û dorber hat pakirin. Dû ra jî xorta legan û mîsin anîn ku bira mîvan dest û devî xu bişon. Wana her yekî peşgirek li ser milî wan û sawûnek jî li destî wan da wû. Avê di mîsin da germkirî wû. Pêsta Hesên Beg hat û av li destî wî kirin. Wî pêra deste xu bi sawûnê şuştin, para jî ew deste xu yî sawunkirî bi du tiliyî xu bir kir devî xu, dev û didane xu jî bi wî avayî şuşt û pa kir. Li dû wî jî Hecîbram Beg û mîvani din ew wezîfe bi dorê anîn şûne. Qasi 30 kesî ew şivxarin û destşuştina di hûndirî niv saetikê da xelaskirin.

Li cem kurmanca eşîr xarin bi vî avayî bû. Bi lez û bez! Paşê mêr derketin derva. Hîneka ên ku hacete xu hewûn berbi nevalê çûn ên ku dixastin tutinê bikîşînin û li hindê mezina ji ber fediya ew nedikarîn jî çûn yek cixale pêçandin. Li du va şîvana kişandina titûnê jî pîrr xwaş diwû. Zaro eşîrê jî bi qarandin û çîcîkî jî bi tirs li sîyariye Têrika mêze dikirin. Ji ber ku mezini wana di şevi zivistane yê dirêj da tim qala dizî û eşkiyatiya Têrika dikirin. Ji ber ku ew eşqiyaye bi tirs û how, ew dize bi nav û deng nika gî li wir wûn. Wana ji serî da heta ninga bala xu dida wana. Ji bo yî ku wana paşê ji heval xu ra qala wana bikin. Û xu di listikê da wek wana bikin.

Hînek ji zarya jî nediwêrin warin li wana binêrin, xu di bin pêşa dê û pîrên xu da veşartî wûn. Ji ber ku meriya war qala wana kiriwûn ku wana zarya direvînin û wek hûtan e û pîrr hov in jî. Ji zarya komek jî li benda qedandina kişandina titûne wûn. Wana jî hema dimeşiyar û boçike titûnê berhev dikirin û li navhev da di derik dizikî da ew bi kêfekê dikşandin.

Do ye heye....

Dema ku kurdan nav li demsal û mehan kirinê, li ser wana jî kilam gotine

Jordan

Payîz: Em hatine payîzê, çêkin çiyê ezîza.

Zivistan: Zivistanê tengava, bar merenê.

Bihar: Bahârê, berekê datê xarê, Xêlk dibînê çikir darê.

Havîn: Havînê teyr gazî dikin li meydanê, borî roja ramanê(rocîyê)

Çiley a paşîn (zivistana navîn) janvier/januari: çile ye û çile ye, berf datê ji ezmanan, kerra abdel û cinsanê.

Sibat (zivistana paşîn) février/februari: sibata, çi şerê û çi şewatê, xwezî di nav mehan da ne hata.

Adar (bihara pêşîn) mars: hejdê adarê melekeyek datê xarê, gazî dike biharê.

Nîsan (bihara navîn) avrîl/aprîl: taviya nîsanê(barana nîsanê) buhayê malê dunê ye.

Gulan (bihara paşîn) mai/maj: Meha gulanê, xweyî raza bi kul û kovanê.

Hezîran (havîna pêşîn) juin/juni: Yanzdê hezîranê, serê havînê, berê xwe bide zivistanê.

Temuz (havîna navîn) juillet/juli,

Tebax (havîna paşîn) août/augusti: temuz û tabaxê, agir digrê axê, dû radibe ji şaxê.

Îlon (payîza pêşîn) septembre/september: îlonê zik têr e û dunya xayîrê ye.

Çiriya pêşîn (payîza navîn) octobre/oktober:

Çiriya paşîn (payîza paşîn) novembre çirîyê û çirîyê, mâl têr û tijîyê, mirov dibînê xweva çîyê.

Çiley a paşîn (zivistana paşîn) décembre/december

2626 (2014)

Çavkanî: *Grammaire Kurde* 1926, Par L'Abbé Paul Beidar (Prêtre Chaldéen)

ZAZAKÎYA AKSARAY RA

Arêkerdox: *Serdar Öztürk*

Qeyde (kilam)

Wayê Qide çu (to) solixê mi le birne way way¹.
Le çu solixê mi le birne way way.
Mele solixê şima zî biwiro way way.
Way ana ana way way.
Ez bîyo xerîb zî ana ana.
Xu rî şûn derêno, hunê mi zî nêyeno.
Qida şûn derêno, le hunê mi zî nêyeno.
Le siwa derêno çuldê gawir de, hewa mi zî nêyena.
Way ana ana way way.
Ez bîyo xerîb zî ana ana.
Solixê mi zî way bireno.
Qida way solixê mi zî bireno.
Le mera remeşî mebo acî zî zor o.
Axx ana ana ez bîyo xerîb zî ana ana.
Le mi va xoce xoc ele xoce xoce.
Le ti ana babadê xu rî zî bîyo xoce.
Le malê dinya de le çimê ma zî çinî yo.
Axx ana ana le yawrî ana.
Le qusîrdê mi di memonê zî.
Le qide çu şun derêno honê mi zî nêyeno.
Qide inu yawrîndê xo zî siwa derêno hewa mi nêyena.
Axx bîyerê bîyerê yawrê mi zî bîyerê.

Efsane

Tîpiya Pîrike²: Qudike (nameyê cenekêk a) vato wisar ame fekê mart o. Şîya kîşme ser o qincûn buşîyo. Re ewnîya ke tîpî vecîya. Qudike kewta bindê liye. Semedê tîpî ra nêşkena vecî tewer. Uca de boxilmîş bena mi-rena. Na tîpî aşma hîrêne de bena.

¹ Çime: **Ahmet Balta**, dewa Cunqîli ra (Ekecik Cangîli köyü/Aksaray)

² Çime: **Gülizar Öztürk**, dewa Cunqîli ra (Ekecik Cangîli köyü/Aksaray)

Tîpîya Qudike: Na tîpî zî aşma yewine de bena. Qudike ha dewa Guler ra yena dewa xo. Resena Çatî (nameyê cayêk o) uca de tîpî vecêna. Qudike xo tenî ya, qusigun mun de munena, nêşkena vecê. Bindê wori de mirena. Çend rocî peye ya bira û cîrûnê xo vanê na cenêke çirî nêamey keyedê xo. Vecênê tewer gêrenê. Dima merdê Qudike vînenê benê keye. Uca ra dima aşma yewine de tîpî ke vecêna vanê tîpîya Qudike.

Sonike

Cêyki bîyo cêyki şîyo¹. Mîyerdêk esto. Xo rê nişto ro meynî xo, xo rê Qorrî (nameyê ceyêk o.) ra yeno. Yeno ke bizeka ha uca de çerena. Vato ke ina bize guneko yê kimî ya. Ez ina bize berî keye, bize îta de menda. Hekeno bize. Vano ke ez rê buwnîyo ku ne ka nerî ya ke makî ya. Bize ame ra zun (ziwan) mîyerdikî ra vato ke nera makî nera makî. Mîyerdik yeno reseno kiştê dewe. Mîyerdik pat xu ra kuyeno, terseno.

A bize uçka de nuno ro, xu şono keye, ceneke qapî akena. Vana mîyerdik çirî ini bîyo. Vato: Axx, ax, ez e ruşî ez e to ra vacî. Bize ka açka dewa, ez bîyarê keye. Bize ame ra zon. Va ke nera makî nera makî ya bize mi arda. Aya bize ra terso ez ana bîyo.

Vîrameyîşêk

Ko de guyim (gum) biwo². Guyimo dederg bî. Millet ardu çinî bi ke xu rê tano. Inê xu rê şunê, ma nunê xo gênê ma şunê. De her kes gumî çapeya çineno çineno. Camêrdêk zî ma de yeno. Qasê des cenun vîst cenun dewe ra wirî benê ma şunê. Ma şunê dîyardê koyî, ma aye gumî çinenê çinenê. Kenê derzî de, her kes derzê de xu nuno ro xu baştê. Re uno hetê Dardê Elîbaş de nuno ro solix duno xu, re hetê Gawir Golî de nuno ro, re uno na huzdê dîmunde solix duno xu gênê unê verdê kêdê xo. Kenê lîyedê pîlî. Yê teyn teyn zimustunê de şiknenê unê nunê ta. Keyeyê Sildê Qorî zî gewen ko de çindî ardê bax ocaxî. Bax ra zî ardê veşnenê. Denê malî zî. Şî gewen çindî ardê qolîya yixmiş kerdê. Ma şî qoridê Qere Şembazî ra derzê ardê. Waxtê ke ez nişunlî bîya e ke nêşke bîyarê rexmetlî vaşt amey va ti ra inî derzê xu ra rundi. Derzê mi nara here ardbî. E uca de xelesîyo.

¹Çime: **Gülizar Öztürk**, dewa Cunqîli ra (Ekecik Cangılı köyü/Aksaray)

²Çime: **Gülizar Öztürk**, dewa Cunqîli ra (Ekecik Cangılı köyü/Aksaray)

Cegerxwîn û ristek

Alan Pîr Mem

Ji gelek cara re min dixwest ko ez ji vî piyawî têbighêm û ez navroka taybet ji helbesta wîni sax re derencam bikim, bi çend go-tinên pendîni ko lê bên çawa tim û tim ew di dawya hemû ristên xwenî konevanî (siyasî) be çi, çi abûrî, çi civakî, çi evînî, bi herdû beşên wê li cem seyda, evîna netewa kurd û niştîmanya bi hemû gelên di welatê menî mezin û gewre Kurdistan de dijîn û ji xwe beşên din diyare evîniya keçekê ciwan, lêv erxewan ko tim û tim pêye geş bûn û xweşbûn û cîhan.

Ez im cegerê bixwîn

ji derdê we her mame dilbirin.

Seydayê Cegerxwîn ne bi tenê helbestvan bû, wekû yên din, bi tenê rist û helbestan bihûne di çi cûre babetê de, na û ne bi wî mirovê xudan dîtineka welatparêzî bû. Erê gotina kurd û Kurdistan ji ser zimanê wî nediket.

Lê di wê gavê de ji qedir ji di-jminê xwe re digirt û wî tim di-got: “pirsgirêka me bi hukmetên ereb û turk û îranî re ye, ne bi gelê ereb, turk û îranî re ye, û eve pendî

û eve serbixwe ramana şoreşê û têgihîştina rizgarî û azadiyê .

emê vê carê ji we ristekê pirs-girêkî (ez dikarim bêjim) pêşkêş bikim.

û ew di ol û ayinê deye bi taybet, ol û ayina musulmana û ew ya xwe dibêje wekû pîtolhozan û raman-nyar û wekû mirovekî kurdî netewî hoşyar ko dît bê çawa musulmantî bi bandoreke ne baş li gelê kurd di rojhilat û di 1300 salî ji pîvajoka dîrok û mêjiwa musilmantiyê de vegekiye...

De ka em bi hev re bixwînin û bibînin. ji dîwana seydayê Ce-gerxwîn, dîwana pêncê “*Zend A-vesta*” ev rist û raman.

“Muhemed neçûye ezmane”

Ji xwe neçûye ezmana, gor ko ew dibêje ha, lê ka ji me re negot bê çima... çima ew ne pêximberêkî asîmanî bû û ewe yê ko di vê rista xwe de dibêje:

*keseke naçî ezman bi boraq û ker
ji bîra xwe bavê kerê guhçeper*

*muhemed neçûye, ne jî karibû
xema milletê xwe ewî xwaribû*

*mezin bû, giran bû gelek bîrewer
ko quran wî çêkir bi zêr û zeber*

*perîşan û jar û weza û geda
kirin wek bira wî bi navê xweda*

Em nema zanin bê em îca ji ku dest pê bikin, wî di van her çar malikên han de gelek raman pêşkêş kirin û kûrahiya wan û pîrisgirêkiya wan jî her wiha pêşkêş kir di xêza yekem de wekû ko me dît û xwend, wî bi carekê re bawerî nehişt ...ne kes dikare here ezmana bi kera, û siwarê kerê, ji xwe bernade rê, em ê bê ev wêrebûn ji zanebûnekê hatiye li cîkî û li cîkî din em dikarin bê ji pîtolhozanekî hatiye.

Gotina ko pêximberê musulmana li boraqê siwar bûye û rê (asîman bû) girtiye û berî daye Xwedê nakeve serê yê ko baweriya wan bi diyalîktîka cîhanî têt û bi dan û sitandinina mirdin û jiyane heye, yê giyanewî û rewanî bi vê bawermende. Lê heger li tenişt vê baweriya xwe zana be jî, nabe ko êrişan vede yê li beranber xwe û yê dijî xwe bi ramanê û nêrîn û biryarê, wî bawerî bi hebûn û kerestê heye bêtir ji rewan û giyan ve û ev çîrok û efsan û destanên tijî newazî û hest û nîgaş.

Ka îcarê em bizivirin ser xêza duwemîn û ji xwe giringtirîn û

balkêştirîn raman di ristê gişî de ev e, ko “Muhemed ji xwe nikare here ezmana, ev çû û pêre di vêya de dan û sitandin nabe ...û çênabe bibe” bi wateya rastî gotûbêj nabe, lê belê ka wî çiqes ji rastî û bercewendiyê û têgihîştina pîvajoka dîrokê bi vê gotina xwe “*Xema milletê xwe ewî xwaribû*” daye hev?

Şoreşa hebûna ereba piştî Muhemed bû bi xêra wî xelkê ereb bi nasname û netewê xwe naskirin. Erebi bi xêra musulmantiyê bûn xwedî bîst û du dewletên serbixwe. Bi çand, huner, abûrî, leşkerî, siyasî û şaristanî. Û em kurd bi sûcê musulmantiyê bûn şerpeze ko anha em li çar welatan belav in û tu here çî qiraxekê ji cîhanê helbet tê yekî kurd lê peyda bike, hingî geryane, aware bûne, bi çol û pola ketine. Lê em dibînin va ye bê çawa seydayê Cegerxwîn pesnê muhemed jî dide û bi cî dike ko ev mirov qirdê ereba bû.

Lê ka em ê çilo û bi çî zimanî û bi çî peyva û bi çî şêweyekî van gotina şirove bikin? Pîrsgirêka mezin dide ber me û ji me re mijar û dozeke gelekî berfireh û di nava xwe de gelekî dûr û kûr e. Dibê: “*ko quran wî çêkir bi zêr û zeber*”

Muhemed quran nivîsandiye û gotinên wî ji pendî û pîtolhozanî

zêrin, pîroz in, bellam ka musulman wê çilo li vê binerin, li alîkî musulmanên oldar û olperest û li alîkî din ve jî musulmanên bi nav, hema bav û kalên wan musulman bûn û ew jî naxwe û zarokên wan jî musulman in, baş e wekû ko belave li seranserî cîhanê û di hemû pirtûk û lêkolîn û berhem û nivîsara de, Xwedê ew ê nenas quran nivîsandiye û ew ji gotinên wî ne û di rîya cibrahîl de bi ser pêximberê xwe de daxistiye. Ayet bi ayet û bi vî rengî ew jî ji şikeft hera dihat û li xelkê hoza xwe belav dikir, va ye ey gelê min, ey gelê qureyş, ey zarên haşim, îro cibrahîl ev ji Xwedê ji me re aniye û li ser wan dixwend ew axivtinên bi erebî û an jî (hevalên wî bi taybet, lewra di dema wî de jî, ew ên ko musulman bûn, îro ji wan re dibêjin, “kafir” oposiyon bûn ko li dijî wî û raman û tevgera wî bûn.

Lê, de ka em bi hev re piştevaniya Cegerxwîn bikin.

Ma dibêjin; Xwedê li asîmana ye, Xwedê li her derê ye, Xwedê ew e, her û her heye, û dimêne cawîdanê cawîdana ye. Mezinê mezna ye, û ew e ko kurd dibêjin berî ko misilmantî derkeve û berî ko jêder û çavkaniyên wê ji ol û ayîna yahûdî û mesîhî ve derkevin .

Yezdan: yê ez dam, min afirand

mirov xwedî laş û redûn û can.

Xwedê: yê xwe da, ne dizê û ne za, ewe ew Xweda ye.

Xwa: xwayê gewre, mehrîbanê hemû candarên xwe

Zindî: yê sax, yê geş, yê cawîdan, yê ko peyê raman û têgihîştina hebûn û jîyan.

Û em anha li babeta xwe bizivirin û vegerin berdewam bikin madam wilo ye gor ew dibêjin jî, naxwe çima hemû pêxember û hemû ol, ayin û hemû pirtûkên asîmanî ji cem Xwedê (xudanê mezin) li rojhilat bûn..?? her bîst û pênc pêximberên ko navê wan di quranê de hatine gotin li rojhilatê bûn, û hemû ol û ayin ji zeradeştî û manî û bûzî û yahûdî (cîhû) û mesîhî(filetî) û musilmantî li rojhilatê bûn û li rojhilatê wekû ko dibêjin daketiye, û hemû pirtûkên pîroz û pîrr şêrîn li ber dilê xelkê, ev heft milyar mirov, pîrozahiya pirtûkên asîman ji incîl û tewrat û quran û pirtûkên din avêsta û celewe û vîda.

ma çima Xwedê wî pêxiber li emêrika bakur û başûr tine bûn, ma qey ew mirov û xelkên ko li wan welatan cî bi cî bibûn ne kolê wîne, ne candar û aferînên wîne, çima pêxiber bi ser wan de danexistin, çima pêximber li welatê ereba derket, ne li ewrûpa û ne li efrîqayê,

ne li oqyanosya bû, çima li wê çola han derket û pirtûk bi serde daket û bû pêximber?

pirsyarne bê bersiv mane, ji ber ko ev musulmanana û hemû oldarên din ji ayinên cîwaz newêrin bi rastî bi axivin, daku raza wanî veşartî di nava komekê de ji xapandin û derewa . û ne ti derew jî derewne dagirtî hest û newazî û nîgaş dernekevin.

ma çima qey Xwedê hayê wî ji yê din tine bû,ma mirovên rojava û bakur û başûrê zemînê ne wekû yê rojhilatê wê bûn....??

başê naxwe pirtûka quranê ji danîna muhemedê û li vê navê min têbînek heye,gelek sûret û ayetên quranêni *mekî* min şirove kirne di nivîsarne xwenî dinde û min bi rastiyan bi cîkirîye ko ev pirtûk ji danîna mirovaye.

Vaye seydayê Cegerxwîn qencîke muhemedî dîtir li ser ereba dibêje piştî ko ji wan re bû sedema ko empratorîke û seroxanîke erebînî netew li rojhilata pîroz damezirênin.

Ko pêximberê musulmana hemû qatên civakê kirne wek hev, perîşan û pepûk û xizan giş bûne dewlemend û têr xwarin, ji piş wan êrîşan (xezewata) li bin navê (elah û ekber) welatê xelkê bindest kirin,xelk bi zorê kirin musulman,destê xwe danîn ser çand û zimanê xelkê bi

zimanê xwenî netewî ve,zimanê erebî zimanê quranê,çawa ko wilo li kurda hat û li turka hat û li fîrsa hat û li hemû welatên ko wan bi şûr vekiribûn. Vaye ew jî dibêje:

*bi şûr û bi dev wî dikir kêferat
hicaz û yemen wî kirin yek welat*

*di rojên şeran de gelek jîr û mêr
ji êlên ereb re xwe wî kir sitêr*

*bellam pîrr li ser wî civandin derew
derew lê gelek xurt û girs û qelew*

*dibêjin,ko wî xweş Xwedê dîtîye
bellam ew nizanî kiye...? yan çi ye...?*

Di herdû malikên yekemîn de, waye li ser vekirna musulmana ji welatê xelkê re di axive, ew dibê me fetih kir û me navê Xwedê û ala muhemed û musilmantiyê lê hilda û bi vî hawî û bi vî rengî me ol û ayina cîhanî “musilmantî” belav kir û bercewendiya vê,wan êrîş vedidan hoz û mal û keleh û qûnaxên xelkê. wan dida dû empiratoriyê,wan dida dû qîralî û seroxanîkê ji musulmana re li rojhilat landika ol û empiratoriya, wan jî dixwest wekû şaristanên rom û farisînî leşkerî hêza wan li qadeke bindest tevlû gel û milletê wê bidest bixin, û desthilatdariya

xwe li seranserî cîhanê raxin, waye wî çî bi şûr carê û çî bi gotin û peyv û ayetên ko li ser zimanê Xwedê û xelkê re digotin û bi vî hawî ,wî têkoşîn kir, wî li ber xwe û gel û êl û hoza xwenî ereb da bi kêferatî û welatên yemen û hicaz û kirdistan û hemû herêmên ji nêzîk ve bindest kirin.

Û ji xwe ti şer û ceng jê ne diçû,gi digotin «allah û ekber» wî şûrê xwe şûrê Xwedê ji kalên derdixist. û di dilê yê dijmin de (dijminê tevgera wînî ayinîni siyasî, dijminên wînî raman û aydiyolociyê) di çikiland.

Û her diyare ko gava navên êlên ereb têne ziman di lêkolînekê kevin de, muhemed her ewe meznê ereba û seroxanê yekemîn ji empratoriya erebistana musulman re.

Baş e îca me ji xwe mepirsî ka ew derew û virr çine yê ko li ser zimanê pêximber hatine gotin, belê quran jî dibêje û civaka musulmanîni ol û ayinî jî dibêje ko muhemed û berî wî mûsa Xwedê bi bîr û raman û mijûl naskirne, îca de li vê bê aqilî û hêsaniya han, ma qey Xwedê çiyê hetanî bête dîtin,û wekû em dizanin her tiştê ko mirov dikare wî bibîne, ew hebûneke berî her tiştî û ev hebûna ko têtê bin çavkirin wî sînor hene, wî çarçoveyek heye û her

wiha wî nasîneke cîhanîni serbixwe heye û gava ko em wilo dibêjin û em vê didin riwê wan, dibê ev kufre û ev serbixwe bê tiştêkî din kêmaniye ji nav û meznahiya Xwedê re, ma tê bi van nezana re bighê çî?

Ne pirsyara wan pirsyare û ne bersiva wan bersive, ne çare bi wan re heye û ne çare ji wan re heye, hema bere wilo di vê nezaniya xwenî serhik û hov de bin û ew bi xwe zanin bê ko ew bêbextiya li xwe dikin berî ko li me bikin, lê ma çima na, siyaseta xwe bikaranîna olê l ser van nezanan diparêzin.

Hema vaye îro ro, ji dîrokê ko her tişt tède berçavin, çî dera ko musulman lê hene, şere û tim û tim kuştin û aware û birçîbûne ji sedema vî şerîye, û çî dera ko musulmantiya ssed sala bîst û yekê lê heye, ew herêm her û her bi hevrikî û dijminahiya siyasî ve daketiye, çî dera ko musulman lê hebin kuştin lê heye û terolîst lê heye û çî tiştêkî ne baş hebe li cem wan bi taybet tu dikarî peyda bikî.

*Xwedê ger hebî, dê li her cî hebî
çîman wê di ezmanê heftan de bî*

*ne raste ko bibêjin ko peyxembere
bellam em dikarin bibên....rêbere*

*wekî me mirov e, ne tav û ne can
çilo ew siwarî çîwe.... asîman*

*heçî xwendevanên li pey hatine
gelek tiştên pak û şîrin gotine*

Heger hebe ev Xwedê û bi wateya xwe wateya Xwedê, naxwe divête li her derê be, ne li asîman bi tenê be wekû ko musulman dibêjin, û ne di laş di laş û rewan û hebûna îsa de be bi tenê wekû ko file dibêjin, û ne ko yaho be û li orşelîmê wan be wekû ko cihû(yahûdî) dibêjin û ne ko hirmiz be di efsana zerdeştî de û ne ko melik ttawûs be wekû ko êzîdî dibêjin. û ji xwe bûzî Xwedê li cem wan tine û wan wekû van ol û ayînên din gişa nekir û ji xwe ew berî gişa bû jî, ew dibê her miroveke wê Xwedê di nava xwede nasbike, bi mijûlê, bi ghiştina rewanê wîni hindir ve ji *nêrvana* re, û Xwedê li cem wan bi wateya xêrê têt, bellam hevwatera Xwedê li cem wan û zerdeştîya xêr û qenci-yadilovaniyê ye.

Û ji xwe Xwedê musulmana ne wekû xwedayê xelkê gişa ye wekû ko em di quranê de (pirtûka wanî pîroz) de dixwînin, carê em dibênin bê çiqeysî qenc û başe û carna din,tu lê dinêre ko bê çawa bûye agir û dogeh û xwînmij, xwedayê

wan xwedayê xêrê û şerê ye bi hev re,carê forta li xelkê dike (ezê we bişewitînim bi agirê dogehê, ezê we bikin arduwê dogehê, ezê we bikujim.)

Ev ê ji mere dibêje, ji mirov û xelk û kole û candarê xwe re dibêje, xwedayê bi tégîhiştina musulmantiyê ve û bi vê derketinê vaye em dibînin bê çawa ew kesayetiya ko di dîrok û hebûna ol û ayina ve ji layê mirovan ve li bin navê “qusama bin ebdillat” û navê wîni li ser ziman”muhemed” ev da zanîn û xuyaye seydayê Cegerxwîn pêximberî gelek jêre dîtiye, û ko gava em di gotûbêjên xwenî dîrokî de li ser bi axivîn ev nav û nîşan pê nakeve.

Bi tenê (gor biryara seydayê Cegerxwîn) rêbere . rêberê gelê ereb bû, bi azadiya xwe ji nezaniyê,û nexwendinê û nexweşiyên civakîni herî zor û zehmet, û “Muhemed” bi xwe hişt û bi qurana xwe ko xelk bi navê ereba bibhîsin û bi wateyeke din hebûna erebanî dîrokî li Muhemed vedigere.

baş e, îca rê li vê navê em dibînin û li gor van gotinan:

*“wekî me mirov e, ne tav û ne can
çilo ew siwarî çîwe....asîman..?? «*

Ko seydayê Cegerxwîn ew kesayetiya muhemedê ji layên ensirbolocî û biyolocî û hebûnîni sax

birye, ko mirove wek min û te, dixwe û vedixwe û kêfa xwe li pîreka dike, dilê wî dibije wan û dibije her tiştêkî dinî xweş wek min û wekû te, û ewe ew mirovê ko radiza û di axivî çî bi xweş û çî bi nexweş û ji xwe gava ko zarok bû,,carê diçû ber pezê mala bavê xwe dibû şivan û carê dibû sêrwan diçû ber deva, wek wî wekû hemû zarok û sîpe û rewal û xortên wê çaxê, yên di temenê wêde, hevalê wî bûn.

Lêkolînerê menî ko nivîsara xwenî dîrokî bi helbestî hûnandiye, berfirehiya mêjiwa musilmana li ser dirêjahiya hezar û çarsed salî daye ber xwe, lê awayekî dûmahî ko têgihîştin û ramanên ber bi mezin ve jê hîlbijêre û bi rastiyên vê dirêjahiya kûr û dûr di nava rûpelên hebûna agahdariyê de li rojhilata menî kevnar de bi yên xuya û nexuyayîni veşartî ji mere derkeve, çawa ko wî xwestiye vê berhevkirna xwe bi ekadîmiyet binvîse, û derencamên wî li ser vê bîngeha taybet rawestin.

*bellam perçe kirne, ewan ol û dîn
belav bû bi xurtî heta hind û çîn*

*meger bûye destûr û qanûn û rist
bellam piştî wî re gelek maye sist*

*derew pîrr di nav de bi baran hene
weka ba û baran û tawan hene*

*hemû hevrik û dil bi jan û bi gîrr
di vav de xuyane gelek zêr û dir*

*bellam wî ji ên pêşî xo girtine
heçî pak û qencin wî wergirtine..*

Ew xwendevanên zaneyarî ko li pey “muhemed” hatin û ol û quran û rêdarên wê şirove kirin, û her wiha hevrikî û dijminahiya siyasî (muhemed ew fêr kirin siyasetê, ereb piştî wî nema ew hovên çola bûn. Tim koçer û birçî û tazî û nexweş) kete nav wan de, heta ko çar mezheb ji wê dijminahiya wan afirî (henbelî, şafihî, îsmahîlî, malîkî) û ji xwe ev mezhebên malbata sinna ne û hîn ji şîha û nêrîn û mezhebên wan jî hene, û eve peçebûna siyasî li ser desthilatdariyê piştî mirna “muhemed” û her wiha eve perçe bûna rewşenbîrî û ramanî li ser pîrsa quranê.

Baş e û bi perçe kirina va ji ol û ayinê re, ev mezhebên wan piştî vekirên musilmana belav bûn, çawa ko musilmantî bi zora şûrgîha hetanî bi Çîn, Hindê, Taylend, Filipîn, Malîzya, Şênîgal û gelek welatên din yên Qefqazya û Efrîqayê.

Lê belê û di ser vê belav bûna berfireh de ji musilmantiyê re piştî çûna “Muhemed” musilmantî ji gelek laya ve şikest û bi paş de vegeriya, derew gelek ketênê, xap û hîle li xlkê dihatin li bin navê musilmantiyê, û ev giş jî bû dijminahî û hevrikî û dilê xelkê ji hev ma, zikreşî û kîn û rik di nana musulmana de bû gava ko di afirîn û ji zikê ca xwe derdiketin.

Lê baetek din li vê navê pêşkêş dibê û li meye em wê şirove bikin, û bi zanebûn em li dorê herin û werin ewe ko hemû tiştê ko “muhemed” pê derket ser xelkê û di encama wêde ragihand, wî ji ên pêşî xwe girtine, û çî tişteki baş û qenc tde peyda kirye aniye û wergerandiye zimnê xwe û li or xwe çekir (li gor mejyê erebî) hema gergeşiya nimêjê ko tu rojê pênc dana bi ferz bike ji zeradeştiya girtine, û raman û têgihiştina dojhê û buhiştê jî her wiha ji wan girtine, û vaye her pênc navê ferza nimêjê di ol û ayina zeradeştî de hene û hete bi anha jî, ew zeradeştîyên ko mane, ên ko ji şûrê musulmana filitîne “parîsî” van nimêjan bi kattînin û ji alîkî din ve heger em herênê û em li jêder û çavkanîne din ji musilmantiyê re bigerin, pirûka pîroz bi herdû beş û herdû serdemên xwe, “serdema”

nih û “serdema kevin” hatiye wergerandin û “wereqa bin nofel” bi hazîrya muhemedê zîrek û şareza ji zimanê wênî jêderî” zimanê ibrî” wergerandiye erebî û li ser dirêjahiya vê wergerandinê wî wane didanê “muhemed” û wî li gel îza apê xwe pîreka “muhemedîni yekem” xedîce pêximber ragihandin, û ana heger em têkistina ji pirtûka pîroz bînin û em wê bidin himber qurana îronî di nav lepê mede, emê bi gelek wekîniyan ve derkevin û ev serê sse di sse guman jê re navê.

*berî wî jî zerdeşt dibêjî wesa
belê wî gubaztin ji dev çend kesa*

*siwarê kerê reş...şivanê bedew
nikarî herî jor bi fort û derew*

*di îro tu barwer bike vê ji min
muhemed mirove...seza û mezin*

*bellam xweş bizane...ne peyxembere
şehinşah û zana û xweş rêbere*

*bi zanîn mezin kir welaê ereb
li pey wî belaw bûn li rast û li çep*

Va ye ew jî dibêje, ko jêderê jî jêderên musilmantiyê ol û ayina zeradeştiye, lê li gel wisa jî wî daye zanîn ko bê çawa gîhane wan

(gîhaye welatên ereba, cezîra erebî) rêdar û rêbazên ol û ayina zerdeştî:

Mirovek hebû jê re digotin “Rojbah” xelkê îrana kevin bû gerya û gerya û li dêr û pirr kinişt û laleşan rast hat hetanî ko bê bi çi şêwê gîhaye welatê ereba an wekû ko dibêjin cezîra erebî. Û hema çilo gîhaye wan û bi bandoreke xurt û dijwar ji gelek laya ve ti dibê qey bû yekî ji wan û Muhemed jî rabû navê wî guhert û yekî din lê kir daku xelk nizanîbin ev biyane ji herêmê ji welatna din hatiye û li ba wan bi cî bûye û da bibe bi rastî yek ji wan, Muhemed navê wî kire “Selman” .”Selmanê farisî” û bi wilo navê wî derket me ev kes anî ziman ji ber ko wî hemû tişt ji ola zerdeştî ji rêbaz û rêdar û pend û agahiyan ji wan re got, bi wateya ko wî ji wan re li ser ola xwenî pê diaxivî, yana ma siwarê kera reş û şivanê pezîni

kî bedew (Muhemed) karî bû bi wan fort û derewên xwe here jor, bi asîmman keve.

Îca rê va ye seydayê Cegerxwîn û wekî wî gelek din ji lêkolîner, rojhilatnas, zaneyarên ol û ayîna daxwaza baweriyê ji me dike, rastiya ko Muhemed mirovekî gelekî çeleng bû, gelekî mezin bû, bi hazirya xwe, di hindirê xwe de, zana û bîrewer bû, lê li gel vê agahiyê divête em ya din bin çav bikin ko ew ne pêximber e, bellam şahînsah, seroxan û empirator bû, zana û xweş rêber û rêzan bû ji dîroka hoza ereb re.

Wî bi şarezayî û zanebûn firekir, mezin kir welatê ereb bi êrîş û ceng û şerên xwe gîhan û ew millet û çand û kevneşopên ko hiştin li pey wî belav bûn û belav bûn.

Qamişlo, 13-15/7/2013 Z

GIRÎNGÎYEK:

Numra kontoya me hatiye guhartin!

A nû ev a li jê re:

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

AVUKAT TEVFIK DEMİR'İN ARDINDAN

Kamil Sümbül

Bugün gelen bir telefonla, Avukat Tefvik Demir'in vefatını öğrenince; üzümlere onu düşündüm ve anılarını gözümün önüne getirmeye çalıştım. Av. Tefvik Demir, 1981-1982 Diyarbakır Sıkıyönetim Mahkemelerinin birinde görülen, Rızgari/Ala Rızgari ana davasının avukatlarından biri idi. O dönem, Rızgari/Ala Rızgari davasından yargılanan Kürt Devrimcileri onu iyi hatırlarlar.

Av. Tefvik Demir'le ilk karşılaşmam; 1979 Eylül başlarında polise göz altına alındığımın üçüncü günü, kardeşi Mehmet Tefvik Demir ile birlikte tutuklanıp, Mamak Askeri Cezaevine gönderildiğimiz ilk haftası, görüşümüze gelmişti. Kardeşi, Mehmet Tefvik Demir'i görüşe çağırırken, beni de çağırılmayı ihmal etmemiş ve davamızla ilgili görüşlerimizi almıştı. Benim de avukatlığımı almak istediğini söyleyince; arkadaşlarımın bana avukat tuttuklarını, Mehmet Tefviki savunması yeterli olacağını söylemiştim.

Bir kaç ay aradan sonra, Mamak'tan Diyarbakır 7. kolordu



askeri cezaevine götürülmüştük. 12 Eylül faşist cuntasından önce, bir kaç kez daha Diyarbakır'a askeri cezaevinde görüşümüze gelmiş; davamızın açılması için, Adalet Bakanlığına yazılar yazdığını, dava dosyamızın iddianemesini hazırlamayan savcısını da Yüksek Hakimler ve Savcılar kuruluna şikayet ettiğini söylemişti. Rızgari/Ala Rızgari davasının savcısı Yüzbaşı Turgay Çağlar ile bu konuda mahkeme öncesi tartışmaya başlamıştı.

Davamızın duruşmaları, 1981 Temmuz ayında, tutuklanışımızın

üzerinden iki yıla yakın bir zaman geçtikten sonra başlamıştı. 160'a yakın tutuklu 250 den fazla sanığı olan dava, dosyamızın sorgu duruşmaları 40 gün sürmüş, her duruşmada Av. Tevfik Demir hazır bulunmaktaydı.

Her sorgusu yapılan sanığa, savcı Turgay Çağlar, şu soruyu sorardı; "Bağımsız bir Kürdistan'ın kurulmasına taraftar mısın?". Sorgu sırası, kardeşi Mehmet Tevfik Demir'e geldiğinde, aynı soruyu yönelten savcıya, Av. Tevfik Demir söz alıp; "*İddia makamı her sanığa TEMCİT PİLAVI gibi iç dünyalarında ne düşündüklerini sormaktadır. Savcının, sanıkların ne düşündüğünü sormaya hakkı yoktur. Mahkeme heyetinin, iddia makamına müdahale etmesi gerektiğini*", söyleyerek, savcı Turgay Çağlar'a bir hukuk dersi vermişti. Biz tutuklular, mahkeme salonunda kafamızı bile oynatamazken, Av. Tevfik Demir'in bu sözleri hepimize umut, güven vermiş ve sevinmiştik. Bu açıklamasından dolayı, o'na korkunç bir hisle saygı duymaktaydık. Savcı ise hemen mahkeme heyetine;

"Kahraman türk ordusunun görevi başındaki bir subayına; TEMCİT PİLAVI gibi tekrar ederek... diye hakarete bulunmuştur. Av. Tevfik Demir'in tutuklanmasını talep edi-

yorum", demesi mahkeme salonuna bomba gibi düşmüş ve sarsılmıştık. Mahkeme heyetinin, nasıl bir karar alacağını merak etmekle birlikte, savcının Av. Tevfik Demir'e komplo kurmak istediğini anlamıştık. Mahkeme heyeti, kendi arasında bir kaç dakika sessizce görüşürken, biz tutuklular ve diğer avukatlar endişe ile sonucunu bekledik. Gözlerimi Av. Tevfik Demir'e çevirdiğimde; kendinden emin duruşunu ve yüzündeki hafif tebessümü görünce sevinmiştim. Mahkeme heyeti savcının tutuklama talebini şu sözlerle red etmişti;

"*Av. Tevfik Demir'in heyecanını; müvekkili olan sanığın, kardeşi olmasına bağlı olduğumuzdan dolayı, tutuklanma talebinin reddine*", diye açıklaması bizlere derin bir nefes aldırmıştı. Fakat, savcının sanıklara kişisel düşüncelerini sormasını engellememişti. Askeri savcı, aynı soruyu yeniden avukatın kardeşi olan Mehmet Tevfik Demir'e de sorduğunda şu cevabı almıştı; "*Eğer Kürt halkı bağımsız bir Kürdistan kurulmasını istiyorsa, ben buna bir şey diyemem!, Saygı duyuyorum!.*" diye onurlu bir cevap verince, savcı gülümsedi. Bizler ve dava Avukatları, savcının gülümseme tavrını, Av. Tevfik Demir'in kardeşini bu sözlerle mahkum edeceğine yorumladık.

1985'in Ocak ayının ilk haftasında, Ankara Ulus'taki bürosuna gidip; duruşmalardaki tavrından dolayı duyduğumuz saygı ve sevgiyi iletirken, gülümseyerek bana şunları söylemişti;

"Duruşma bitince; mahkeme kaleminden duruşma tutanaklarının kopyasını aldığımda; savcı yanıma gelip, *Burayı Ankara mahkemelerimi sanıyorsun? Ayağını denk at! Bu sefer kurtardın,*" diye beni tehdit etti. Tam mahkeme binasından çıkarken, bir üstteğmen bana tekme atıp; "*Seni bir daha buralarda görmeyeyim!. Yoksa cezaevini, kardeşinin yanını boylarsın!*" dedi."

Tevfik Demir'in, bu olaydan sonra 4-5 duruşmaya gelmediğini görünce endişe ve merak etmeye başlamıştık. Davanın sonuna doğru, savunma aşamalarında yeniden duruşmalara katılmaya devam etti. Duruşmalar sonucunda, kardeşi ile ilgili tek somut delil; savcının sorduğu soru olan *bağımsız Kürdistan'ın kurulmasından yana mısınız değil mısınız* sorusuydu. Başkaca da bir delil yoktu. Ve 8 yıl ceza almıştı. Normal yatmamız gereken ceza süremizin bitmesine rağmen, dava dosyamız, askeri yargıtayda sonuçlanmayınca, benimle birlikte kardeşi de bir yıl fazladan yatmıştı. Son cezaevine gö-

rüşümüze geldiğinde, babamla aynı kabineye düşmüştü. Görüşmede, Kürtçe konuşmak kesinlikle yasak ve riskli olmasına rağmen, görüş bitiminde babamla yüksek sesle kürtçe konuşmasını duymuştum.

Geç gelen tahliyemiz döneminde Diyarbakır'a yerleşmiş gibiydi. Tahliye olmamıza rağmen, cezaevinden ben ve kardeşinin de içinde bulunduğu bir grubu, polisler alırken onu yakınlarımla cezaevi kapısında görmüştüm. Bizleri Diyarbakır Emniyet Müdürlüğüne getirdiklerinde yine bizden önce emniyetin kapısında durmaktaydı. Emniyet soruşturmasını iki günlük "misafirlikle" atlatınca Diyarbakır Saray Kapı'daki jandarmaya; asker kaçağıyız diye teslim edilmiştik. Jandarma karakolu kapısının önünde günlerce ayrılımayı her sesini duyduğumuzda anlıyorduk.

Bir gün, babamla birlikte 10 porsiyonluk Diyarbakır kebabı yaptırıp bizlere getirirler. Nöbetçi Üstteğmen'in kebabları içeri almak istememesi sert tartışmaya yol açtı ve bizler kaldığımız nezaretten tartışmaya kulak misafiri olduk. Kebapları içeri veremeyince, kızgınlıklarından dolayı kebabları Dicle nehrine uzayan yüksekçe bir yerden aşağı attıklarını anlatmıştı.

Bir hafta sonra Cihanbeyli Askerlik Şubesinden gelen bir izin kağıdıyla kardeşini alıp gitmişti.

1984'ün Aralık ayında tahliye olduktan sonra geldiğim Ankara'da gidebileceğimiz, selam verebileceğimiz insan sayısı yok denecek kadar azdı. Geçmişte, birlikte olduğumuz, tesadüf sonucu tutuklanamayan 'dostlar', hapisten çıkan bizlerle karşılaşınca, yollarını değiştirirken, onun avukat bürosunun kapıları bizlere her zaman açıldı. Gidip oturabileceğimiz, nefes alacağımız, çay içebileceğimiz nadir mekanlardan biri idi. Bizlere, kürt sorununu, öğrenciliğinden beri izlediğini, Haymanalı olan ve 1977 de elini bir trafik kazasında kaybedilen Kürt yurtseveri avukat Vahit'in bu büro'da avukatlık stajını yaptığını söylemişti. Konya Cihanbeyli'ye bağlı Hecilera (kuşça) köyünden olduğunu ve bir kaç yüz yıl önce mecburi iskana tabi tutulduklarını ve Cihanbeyli'ye yerleştirildiklerini anlatırdı. Reşwan aşiretine mensub olduğunu söylerdi. Urfa-Adıyaman civarlarından geldiklerini bahsederdi. Bürosuna her gittiğimde; "Benimle gel, mecburi iskana tabi tutulmuş Kürtlerin; yerleşik alanlarında duruşmam var, seni onlarla tanıştırayım, ki iyi tanıyasın", diye söylenirdi. Onun sayesinde, Cihanbeyli, Haymana, Kulu, Ömeranlı,

Gölbaşı, Polatlı, Karacadağ, Burunsuz ilçe ve köylerini görmüş, evlere misafir olmuştum.

2013 Şubatında Diyarbakır'da, ağır hasta olduğumu ve Ankara'da hastanede yattığımı duydum. Planımda olmamasına rağmen, Ankara'ya gidip, kaldığı hastanede ziyaret etmek istemiştim. Aynı soyadı taşımadığımızdan dolayı, ziyaretim gerçekleşmedi. Oğlu Ceme, selam ve saygularımı, iyileşmesi için şifalar dilediğimi iletmesini ve onu unutmadığımızı söylemesini rica ettim. Hastahanenin kafeteryasında, yakınlarıyla bir müddet sohbet ettim ve 12 Eylül darbesi döneminde, Diyarbakır mahkeme duruşmalarındaki onurlu tavrını anlattım.

Güle güle Tevfik ağabey! Her 5. nolu yargulamalarını hatırladığımızda; seni de hatırlıyoruz ve de hatırlıyacağız. Mekanın cennet, toprağın bol olsun.

Yengemiz Ayşe hanıma, çocukları Cem, Çolpan ve Serez, kader arkadaşım olan 5. nolu'da direnç ve onurlu tavırlarıyla grubumuzda **kahraman** olmayı hakeden kardeşi Mehmet Tevfik Demire, diğer kardeşlerine baş sağlığı dileklerimizi iletir, kalanlara sabır ve uzun ömürler dilerim.

2013 10 29

siwarê şînbozê Êlas Efendî


Ji bo gelek kurdan Êlaso yan jî bi gotineke dinê “Êlas Efendî” ne yekî naskirî ye, jî ber ku tişteki zêde yê nivîskî di derheqê wî de tune ye. Lê kesên ku li rûpelên Hawarê yan jî li kitêbên biranînên navdarên kurdan ên dema wî binêrin, bi çend gotinan be jî mirov ê li navê wî rast bîn.

Hata bi niha jî di derbarê organîzasiyona hereketa Şêx Seîdî ya mintîqeya Mêrdînê de tişteke nehatiye nivîsîn û her weha qala hewildayina rola derûdora Mêrdînê ya di derbarê Hereketa Agiriyê de jî nehatiye kirin. Êlas, yek ji aktivîstên wê demê bû ku di herdu berxwedanan de jî rol û dewrek listiyê û herweha di Mahkemeyên Îstiqlalê de hatiye mahkemekirin û li dû wê jî hatiye sirgûnkirin. Li dû sirgûnê careke din vegehiyaye Dêrikê û di organîzekirina Hereketa Agiriyê de bi Xoybûnê re beşdarî plankirina girtina li ser Mêrdînê bûye.



Êlaso kî bû?

Êlaso, lawê Hecî Osmanê Reşoyî û her weha mezinê eşîra Mahmûdî bû. Mahmûdî yek ji pênc eşîrên Dêrika Çiyayê Maziyê ye ku li gora xwe xwedî rol û fonksiyon bû.



Ew yek ji serokeşîrên dema xwe ye ku zû bi kurdîtiya xwe hisiyaye û li doza xwe bixwedî derketiye ku ew heta bi dawiya emrê xwe li ser rêya bîr û baweriyên xwe çûye, wî li xerîbî û sirgûniyê wefat kiriye.

Teva ku Êlaso serokê eşîrê jî bû, jî ber ku ew di meseleya kurdî û milletperweriyê de xwedî şîûreke milî bû, wî nikarîbû dijminayî û berberî bi eşîrên Dêrikê û wê mintîqeyê re bikira.

Êlas Efendî, hemû îmkânên xwe yên malbatî, qudret û îqtidara xwe li hêlekê daniye û di rêya xelasiya milletê xwe de bûye figurekî siyasî û li Binxetê, di temenekî ciwan de wefat kiriye. Bi vê wesîleyê em dixwazin keda wî, fedekarî û welatperweriya wî bi bîr binin.

Bi minasebeta 80 saliya wefata Êlas Efendî, romaneke Enwer Karahanî ya bi navê “siwarê şînbozê Êlas Efendî” jî weşanxaneyê APECê derketiye.



"Moschophoros" (carrier of calf/barkêşê golikan)